

# welat

Sal:2 Hejmar:62 25 Nisan-1 Gulan 1993 5000TL (KDVD)

Rojnameya Hefteyî

Turgut  
Özal  
mir

Rüpel 5



*Qetlîam, talan, koçberkîrin, an jî cerdevanî*

## TC gundan ji mirovan paqij dike

Rüpel 8



Bibişirin zarokno, hûn li ku û di çi rewşî de bin bibişirin. Jiyaneke nû û azad ava dibe, bi hêvî bin û bibişirin.



### ENSTÎUYA KURDÎ KONGREYA XWE ÇEKIR

Enstituya Kurdi, ji bo dewra nû ku xebatên xwe bi lez bidomîne, kongra xwe çekir û Heyata xwe ya Rêveberiyê hilbijart. Ji aliye din ve, ji bo dewra nû li ser bername, û xebatên ku divê Enstitû bike pêşniyar hatin pêşkêşirin.

Rüpel 11



### BAVÊ EŞO

Bavê Eşo eskerên Romê kirine sê şopan. Fenanî gurekî bikeve nava kerîye mihan, ji xwe re berx û bera nan ji nav vegetine. Gelekî ji wan dikuje, ihtimal e ji şûn ve vegere. Lî lê dayê heywayê, dayê heywayê, wele nayê, gazî dûr e, îmdad-nayê.

Gavan Koçer  
di rüpeala 12'an de nivisi

# REWS



Abdullah Keskin

## "Xewneke xwes"

**R**oja 9'ê Nîsanê em li Enqerê bûn. Di şeva ku HEP'ê ji bo Serokê YNK'ê Celal Telabanî çêkirî de, nezîkî 150 ronakbîrên Kurd, pişti demeke direj, belkî cara yekemîn dihatin ba hev.

Li ser zimanê herkesî "yekîti" hebû: Yekîtiya miletê Kurd, biratiya Kurd û Kurdan. Berî bi demekê kesen besdarî şevê bûbûn, zahmet bû ku li "dînyaya din" jî hevdu bibînin. Ji wê yekê jî, gelek kes bi awirêna vala li dora xwe dinêrtin.

Serok Telabanî, di axaftina xwe de li ser biratiya Kurd û Kurd sekînî û ev gotinê İsmail Beşikçî neql kirin: "Kurdan heta niha behsa biratiya Kurd û Tirkan, Kurd û Ereban, Kurd û Farisan kirin, lê biratiya xwe ji bîr kirin. Gerek e berî gelên din Kurd xwe bi xwe, ji xwe re bibin bira. Wextê Kurd nebin birayê hev, nikarin biratiya Tirkan, Ereban û Farisan jî bikin."

Peyva yekîtiyê, "yekîtiya Kurdan" nabza civakê girt, çepik ji herkesî stand.

Dema nû, pêvajoya yekîtiyê û şersekinandin, tiştine bingehîn di nav dû û dûxanê de dihêle. Ji vê yekê jî, dixwazim li ser çend nuqtet-

yan bisekinim.

Berî her tiştî, tu kes dev ji çekan bernade. Ne Serokê PKK'ê Abdullah Öcalan, ne jî rêvebirekî cephe an qumandarekî ordiyê behsa berdana çekan nekirine.

Çekên gerîla, ARGK hêviya gelê Kurd e. Emniyeta gelê Kurd jî bi wan çekan e. Gerîla xwe bi xwe bêsileh nake, ordî xwe tu çaran naveşikilîne. Bila tu kes wan xeyalan ji xwe re çeneke.

A duduyan, li welatên anti-demokratîk sîleh roleke mezin dilizîn.

**Berî her tiştî, tu kes dev ji çekan bernade. Ne Serokê PKK'ê Abdullah Öcalan, ne jî rêvebirekî cephe an qumandarekî ordiyê behsa berdana çekan nekirine. Çekên gerîla, ARGK hêviya gelê Kurd e. Emniyeta gelê Kurd jî bi wan çekan e. Gerîla xwe bi xwe bêsileh nake, ordî xwe tu çaran naveşikilîne. Bila tu kes wan xeyalan ji xwe re çeneke.**

Ev 70 sal in ji şerê çekdarî pê ve tu rî li ber Kurdan nebûn, hemû derî girtibûn. Kurdan, tariya şevê bi sîleh ronahî kirin. Sîleh ne senem in, ne fetîş in, lê hecî iro rola şerê çekdarî di têkoşîna neteweyî de nabîne, ji serî heta bi binî, di nav cehaletê

de xeniqiye.

PKK, bi xwe bi çekan bû PKK. Dewlet bi darê kotekê hate vê merhaleye. Di vê guherinê de, rola sîleh nayê înkarkirin. Sîleh rolekî geleki mezin ú girîng lîstiye.

Mirov dikare bibêje ku, di konjekturna dînyayê ya iro de, çek tenê bi serê xwe ji bo çareserkirinê ne bes in. Tu kes vê rastiyê încar nake. Ger iro pêşveçûnek hebe rola sîlehan, şerê çekdarî di vê pêşveçûnê de gerrek were dîtin.

Hevpeyvîna ku me bi Serokê YNK'ê Celal Telabanî re kir, hetfeya derbasbûyi di Welat de weşiya.

Telabanî rola şerê çekdarî dizane û taqdîr dike, ji berî ku ew jî partizanekî kevn bû. Li Başûr ew bêhtirî 30 salî ye ku, li dijî faşizma Baasî şerê çekdarî û siyasi dikirin. Telabanî vê hilpişkîna PKK'ê wek "şoreşike siyasi" dinixîne.

"Kurdistanek serbixwe û yekbûyi" wek "xewneke xwes" tê dîtin. Kurdîn Başûr li dijî dewletên kolanyalîst (Tirkîye, İran, Sûriye) û Rojava gelekî xebitîne, ji ber wan bidin bawerkirin ku, ji Iraqê venaqetin û dewleteke serbixwe naxwazin. Ev mirov ji hevdu re hînekî siyasi dike. Sînor ne mutlaq in. Berî bi 3-4 salan kî digot Yekîtiya Sovyetan wê veşikile.

Ü berî bi çend mehan kî digot Kurdê Bakur Başûr tev de wê bêne ba hev û ji bo yekîtiya neteweyî gavêne mezin biavêjin.

Ew jî berî bi çend mehan "Xewneke xwes" bû.

## FERHENGOK

- Awaz:** Deng (ses)
- Azerde:** Tade (eziyet)
- Bac:** (vergi)
- Bask:** Perr (kanat)
- Demsal:** Werze (mevsîm)
- Dezgeh:** Sazî (kurum)
- Dîmen:** (manzara)
- Efsir:** Sar (soğuk)
- Efsirandin:** Cemidîn (üşümek)
- Ferec:** Berbang (şafak)
- Gelemşe:** Gelş (sorun)
- Geli:** Newal (vadi)
- Hêvoj:** Perwerde (eğitim)
- Hêvotin:** Perwerdekirin (eğitmek)
- Hêvojkar:** Perwerdekar (egitimci)
- Kulin:** Metbex (mutfak)
- Ked:** (emek)
- Kedkar:** (emekçi)
- Kersax:** Kevî (kiyî)
- Pêkenîn:** Qerf (mîzah)
- Pêşbazî:** Reqabet (yarışma)
- Pêşeng:** Pêşawa (öncü)
- Pêşniyar:** (öneri)
- Pêt:** Rivîn (alev)
- Qels:** Zeyîf (zayıf)
- Qonax:** Merhale (aşama)
- Şemirandin:** Terikandin (terketmek)
- Xwedî:** Sahip
- Vexwendî:** (davetli)
- Yarmetî:** Alîkarî (yardım)
- Yezdan:** Xwedê (Allah)
- Zayend:** Cins (cîns)
- Zevî:** Tarla

## Rabin ev şores e lê serxwebûn gelek xwes e!

Berî her tiştî ez gelek dilxwezi li rojnamevan û xebatkarên Welat dikim û xebata we ji dil û can pîroz dikim.

Ey gelê dîl êdî bes e ev bindestî, ev zilm û zor, ev koletî. Hevalêne me gişt bûne gerîlayen ARGK'ê, em hê jî bi mal û milkê dînyayê mijûl dibin. Ma poz li we nasewe? Bi hezaran keç û xorten me bi işkence û di girtîgehîn dijmin de hatine kuştin, cih û warên me hatine bombekirin. Êdî dar û giyayen çiyayen me nema li şûna bombevênen dijmin şîn dibin. Temamî gul û sosinên çiyayen me li şûna bombevênen dijmin hişk bûne, gund û bajarên me wêran kirine. Gelî ciwanên hêja ji xwe re bifikirin, bixwînin û bibînin.

Dev ji mal û milkê dînyayê berdin, li ser welat û gelê xwe yî bindest bifikirin. Hînek xorten me hene dibêjin em nimêj dikin û misilmaniya xwe didomînin. Lê pirî wan raste rast nizanîn nimêjî jî bikin. Nxwenda û cahil in. Nizanîn bi tu tiştî, zilm û zorî çiqas zahmet e jî, nizanîn. Li ser zilm û zorî

ya li ser xwe nafikirin, lê dibêjin em misilmaniya xwe dimeşînin. Lê heta êvarê li dû qîzikan digerin. Ez ji wan re dibêjim, ev ci misilmaniye yê û Xwedê Teala dê çawa qebûl bîke? Mirov nimêj û rojî bigire, lê ku dilê mirov saff nîn be, mirov ci bike hemû beredayî ye. Dema dilê mirov paqîj be û neheqiyê li kesî neke, zilm û zora li ser xwe qebûl neke, vî çaxî mirov dikare bibêje em misilmaniya xwe dimeşînin. Lê ez iro dinêrim ku haya wan ne ji welêt û ne jî, ji gelê wan i bindest heye.

Hevalên hêja, ez xortekî hivdeh (17) salî me. Ez pirî caran nimêj nakim. Lê dilê min her tim saf e. Ez her tim li ser welat û gelê xwe yî bindest difikirom.

Ez dibêjim gelo heye ku, em ji binê vê bindestiyê derkevin û serfiraz bibin? Ji roja ku rojnamevan derkeviye heta iro, ez dixwînim û ez dibînim. Car na hevalên min ji min re dibêjin, "Tu çima nimêj naki." Ez dibêjim: "Heya ku welatê

min û gelê min serfiraz nebin, ez nimêj nakim." Hevalên hêja, şas fêm nekin. Ne ku ez dibêjim nimêj nekin, rojî negirin. Xwedê Teala gotiye ku gerek e zilm li kafran jî nebe û neye qebûlkirin. De vêca em di bin zilmê de ne, tehdâ ku li ser me heye, em rabin nimêj û rojî bigirin. Lê ez dibêjim nebû û ne rast e. Elhemdülillah em gişt misilman in, lê em iro bindest in û zilm û zorî li ser me heye.

Gotineke hate bîra min. Rôjekê rojnamevanekî Tirk dice ba Serok. Dinêre ku Serok pê re radibe û rûdine. Rojnamevan dibêje: "Ya Serok tu qet naşîbi serokên dewletên din." Serok dibêje: "Bi ci awayî." Rojnamevan dibêje: "Tu bi min re radibî û rûdînî, dema em diçin ba serokên dewletên din, tenezul nakin bi me re biştexîlin." Serok dibêje: "Xwedê gotiye ku gerek e evdê min xwe ji hev mezintir nebînin." Rojnamevan dibêje: "Nexwe hûn çîma nimêj nakin?" Serok: "Niha ezê tiştîki ji te bipirsim. Na- mûs ci ye?" Rojnamevan: "Mi-

nimêj xwe xera bikim û herim hewara pîreka xwe." Serok dibêje: "Ev namûs pirr biçük e. Lê ya mezin welat e. Ya me jî ya mezin welat e."

Vêca ez jî dibêjim heya ku zilm û zordarî li ser me hebe, nimêj jî nabe û em ci jî bikin beredayî ye..

Gelî xorten hêja namûsa mezin welat e, pişt re jin û pîrek e.

**Sundayî /Midyat**

## Heta piştî pênc roj dinê

Axt Welatê hêja, ax welatê min Tu nizanî iro ev çend roj e J'ber te hêstir xwe l'çavê min nagirin Dilê min her wext l'cem te ye Bedena min l'Stenbola xopan e.

Ev çend roj e, rojan dijmerim yek bi yek Iro jî çû piştî pênc rojê dinê ez l'welat im Ey dilê min vêca bes e neke zarzar nema gelek Bi kol kek dilê min "Gelo ma ezê bimînim sax" Heta piştî pênc roj dinê

Welato, kulê te ser dilê min hêşîn kirin Ev çar heyye e dilê min tim kér birin Gelo b'vê birînê ma ezê bimînim sax Heta piştî pênc roj dinê

**Mustafa Cizîri**

# Li Kerboranê terora cerdevanan

**Navenda Nûçeyan-** Cerdevanen gundan bi alikariya hêzên dewletê terorê li ser gundiyan di meşin. Cerdevan, gundiyan li meydana gund li hev diciyin; iskence, tehde û pêku li wan dikin, mal û qutê gundiyan beri nava hev didin.

Cerdevanen gundan **Kerbên** ku gireday navceya **Kerboranê** ne li ber windabûna kurê cerdevan Îsmail, di 12'Nisanê de cerdi, ser gundan **Derece, Îzar, Be-razava, Gundikê Haci** û mezreya **Tirêva** kirin.

Cerdevanen gundê Kerbên bi destek û pêskariya hêzên dewletê li gundiyan ku navê wan li jor derbas bûn îskence û heqaretê dikin, gundiyan li meydana gund diciyin li wan gefen mirinê dixwin û çekan bi ser wan ve diteqînin, dest datinin ser mal û eşyayen wan i giran û buha.

Heta cerdevan li Gundikê Haci, piyê Gulbuhar Doğan ku 30 roj e zarok anye dinê, birindar dikin.

Li ser terora cerdevanan gelek kes bi destek û pêskariya Qu-mandarê cenderman ê Kerboranê ku navê wi Ali ye hatine binçavkirin.

Gundiyan ku hatine girtin li gorî gundan ev in:

**Dereca:** Behçet, Muhyettin û Suleyman Örnek, Emîn, Abdül-



Cerdevanen gundan bi kincê fermî û çekêne xwe ve di meşekê de

lah. Ramazan û Ömer Demîr, Ali, Ömer û Kadî Yaman, Behrem Zirek, M. Selîm Orak, Mustafa Oral, Mehmet Savci, Selîm Demîr, Huseyin Aydin, Murat Demîr, Abdullah Turgut, M. Emîn Duman, Huseyin Çelik, Ebedin Aydin, Yusuf Savci, Ali Oral, Ebedin Çelik, Abdullah Savci.

**Berezava:** Mehmet Kartal, Metîn Demîr, Abdullah Durmaz, Mehmet Durmaz, Hamît Kaya, Şemsettin Kaya, Nurî Kaya, M. Emîn Özçelik A. Rahman Özçelik, Latîf Özçelik, Bedrettin Kartal, Mahmut Kartal, Hamît Güñüdz, Yasın Ağırman, Îsmail Agırmân, Salih Alpakaya, Murat Akbulut, Cemal Durmaz, Ekrem û

Tevfik Durmaz  
**Îzar:** Reşit Acar, Huseyin Doğan, Osman Demîr, Haci Acar, Kadî Acar, Ridvan Acar, Kasim Tural, Ahmet Özkan, Huseyin Keleş, Teyfik Akar, Tahir Demîr

**Tiriva û Gundikê Haci:** Mehmet Atadoğan, A. Samet Doğan, Ali Demîr û M. Selîm Doğan.

Ev gundi li qeqola gundê Kerbêne mîna rehin hatine girtin. Ev gundi cerdevanan li gundiyan dorhêlê gefan dixwin heta ku kurê serokê cerdevanan neyê ditin ev kes nayê berdan, ger ku tistik pê werê dê tolê ji gundiyan girti hilin û mal û xaniyêne wandê bişewitîn.

## Serqediyaneke hate kuştin

Serqediyaneke Girtigeha Batmanê di êrişike çekdar de hate kuştin.

Li gor agahiyen ku tê, serqediyane Hâlid Pekcan (50), roja 23'ê Nisanê, di otobusekê de ku diçû mala xwe, hate kuştin.

Livbazvan bi serfirazî ji cihê bûyerê dûr ketin û kes ji wan nehate girtin. Serqediyane Hâlid Pekcan, mîna mirovekî îçkencevan dihate naskirin.

## Mamosteyek kuştin

Li Diyarbekir, li Taxa Baxlaran, mamosteyek bi êriş 3 kesî hate kuştin. Mamoste Ali Han, li dibis-tana 'Endustrî Meslek' ê kar dikir. Ev êris ji aliye kîjan grûbê ve pêk hatiye, ne kifş e.

Cendekê Mamoste Ali Han, li cihê jidayîkbûna wî, Erzeromê hate binaxkirin.

## Kontra dev ji cinayetan bernade

Navenda Nûçeyan- Li gundi Serdehêl cendekê yeki kuştin bi navê xwe A. Hekîm Tanrıverdiye, hate ditin. Li gorî gundiyan Basîkê, A. Hekîm Tanrıverdi, di roja 9.4.1993'an de ji gundiyan aliye hizbî kontra ve hatiye revandin. Gundî ji bûyerê Yuşuf Tanrıverdi ku bi xwe aligirekî Hizbullah e. dibiñin.

Li Hezexê, hêzên dewletê dest bi operasyonê binçavî dikin. Li ser girtina militanekê ku bi bernavkê xwe Gulan e, heta niha **Hasan Demîr, M. Nûri Akdoğan, Mehmet Özalp, Hasan Çagli** hatine girtin.

Ji aliye din ve, dîsa hêzên dewletê listeyekê li muxtarê navceya **Hezexê** ya Şîrnexê belav kirine û navê cil mirovan tê de hene. Hêzên dewletê teslim-

## Birêz Jale Şanlı

Min bihist ku tu û hevalen xwe şehîd bûne. Bila be... Ji bo ku gelekî bi her awayî ketibe rabe ser xwe, şehîdbûn jê re bivê, ew şehadet bi xwe dibe nîxê gel. Ü gel bi her awayî li wî nîxî, li ser piya, bi serbilindî xwedî derdi keve.

Ji bo ku careke din qet netewe û stuxwar nebe!

i. Xort, Şîlan, Argeş



# HAWAR

## Dilbixwîn

### Ji bo Enstituya Kurdi

**D**i konferansa xwe ya yekemîn de, ku di dawiya 1992'an de hatibû lidarxistin, YRWK (Yekîtiya Rewşenbîren Welatparêzen Kurdistan) bîyar standibû ku li Ewrûpa Enstituyeke Kurdi ava bike. Ev bîyar weke bangekê ji rojname, rewşenbîr, saziyên rewşenbîr û endamên Yekîtiye re hatibû hinartin.

Di banga xwe de, Komîteya YRWK ya Kargir alikari û pişgiriyê dixwaze. Ji xwe ji bo gavaveteineke wiha girîng alikariyeke mezin gerek e. Bê alikariya rewşenbîr û saziyên rewşenbîr yên demokrat û pêşverû, gava ku were avêtin wê zeif be. Ji lew re divê têkiliya di navbera YRWK bi wan re gelekî tunde be, hem nîrîna wan bistîne hem ji di gelek alîyan de ji wan re bibe alikar, yanî hem bide hem ji bistîne.

Li gorî nameya ku hatibû hinartin, wê di pêşeroja nêzîk de kampanya ji bo van kar û baran were vevirin. Ev kampanya duali ye: Diravî, Çapemenî. Alikariya maddî ya ku were civan-din, wê di bin navê Weqfa Çanda Kurdî de were parastin, bi vê Weqfe Enstituya Kurdi tê avakirin. Weşanên ku werin şandin ji wê ji bo Pirtükhaneya Neteweyî ya Kurdistanê bin, ji ber ku Enstitu dixwaze girîdayî xwe, pirtükhaneyekê ava bike. Ev ji gaveke pîroz e, hemû nîrxen me edebî, keleporî, dokument û arşîvîn me li Kurdistanê di talûkeye de ne, cihekî ku bikaribe wan biparêze geleki girîng e.

Li vir ez dixwazim. Pirsekê bikim: Em Enstituyeke çawa dixwazin?

Weke tê zanîn heyâni-ha gelek "Enstituya Kurdi" li derveyî welat çebûne. Pirranî wan du sê gav neavêtin û iflas kirin, ên man ji weke enstituyan rola xwe neleyistin, ji qalibê komeleyan derneketin. Ji bili çend karên pirr biçük tiştek nekirin.

karên pirr biçük tiştek nekirin. Mesele ne meseleya înkarkirin ye, na! Tiştek nekirin, eger kiribin ji ne karên ciddî û berçav in.

Enstituya Kurdi ya Parisê heye, ya Bonnê hebû dibêjin serokê wê pere revandin û cû li Çekoslovakya buroyeke ticaretê vekir, a Brûkselê hebû lê niha ji heye ez bas nizanîm... ya Stenbolê ji li meydanê ye. Gelo, kesen ku ev enstitu ava kiri-ne, ji xwe nepirsine: "Ji bo ci em van enstituyan ava dikin, wê bi ci karî rabin, emê bikarîn kargiriya wan bikin?" Mixabin li gorî ku encam diyar dike, ji xwe nepirsine, yan ji ne ciddî bûne.

Min cû ya Parisê dît. Xwezi min nedîtibûna. Kavilekî wêran û bêkes. Gelo xwedîyê vê avahiyê tune ye! Eger hebe cîma xwedî lê dernakeve? Dema ku em derbasî hundir bûn, me rojbaşek da. Keçikek li hundir, li qaseteke vîdyo temaşe dikir. Hem temaşe dikir hem ji pîjek di destan de bû û goreyeke ji rîs ji xwe re çedîkir. Di bin çavan re li me meyizand û bi zimanekî sist got: "Roj baş." Me got: "Gelo, em dikarin herin li pirtükhaneyê bimeyzînîn. Got: Mixabin ez nikarim deri vekim, pişti du saetan hûn dikarin werin." Hevalê bi me re, xwe da nasîn. Pişti hevnaskirin, deriyê pirtükhaneyê ji me re vekir.

Pirtükhaneyê ji me re vekir. Bawer bikin komele ji ne wisa nin. Bi kîmanî ew komele bi karê xwe yê komelayeti radibin û di nava gel de pîrsa welat-parêzi û hisyârbûnê xurt dikin.

Enstituya ku were avakirin, divê dest û piyên wê hebin. Enstituya ku heye niha hatibûne avakirin bê dest û pî bûn. Ji bo rojeveke teng hatine avakirin, ne ji bo gel ne ji, ji bo dîrokê tiştek pêşkêş nekirin.

Hevalê YRWK'ê di vê gavaveteineke de gelekî ciddî ne. Ger alikari û piştgirî hebe, wê pirr xurt were avêtin û gelek xizmeten mezin pêşkêş bike. Hem bibe şaxekî Kurdo-İslâmî û hem ji bibe navenda lêkolîn û lêgerînan.

Ji bo hemû rewşenbîren bi şeref, pêşverû û demokrat, ez bang dikim: Werin bibin hîmdarîn Enstituya Kurdi li Ewrûpa!



Husni Mubarak û Izak Rabin di hevdîtinê aştiyê de

## Ji nû ve hevdîtinê aştiyê

**Hevdîtinê Aştiyê yê nav Îsraîl, dewletên Ereb û Filistinê de didomiyen û di Kanûna 1992'an de bi sirgûnkirina 450 Filistiniyan ve rawestiyabûn, di 27'ê Nisanê de li Washingtonê ji nû ve dest pê dikan. Dê ev hevdîtin bibe yê 9'an. Di vê navê de êrîşen Îsraîl yê li ser erdê Lubnanê jî didomin.**

**Nûçeyên Derve-** Îsraîl li Lubnana Başûr dest bi êrîşe-ke nû kir. Roja 21'ê Nisanê, Îsraîl bi topên giran hêla

îklîm Et-Tuffah ku wargehêne Hizbullah lê ne, bombebaran kir. Di vê êrîşâ Îsraîl de, yek jê 65 salî 2 kes hatin kuştin,

9 kes jî birîndar bûn.

Îsraîl vê êrîşê li ser livbaziyan Hizbullahê pêk anî. Hizbullah, roja 20'ê Nisanê êrîşî Îsraîliyan kiribû û 2 mîlis revandibû.

Piştî vê êrîşâ Îsraîl, ji nav erdê Lubnanê fuzyeyen Katyüsa bi ser Îsraîl ve hatin avêtin. Topê Lubnanê jî, bersiva êrîşâ Îsraîl dan û gelik gulle avêtin Îsraîliyan.

Li aliyê din, leşkerên Îsraîl li Xeta Gazze jî 50 kes ji Filistîniyan birîndar kirin. Bûyer bi kuştina endamekî Hamasî dest pê kirin. Roja 20'ê Nisanê endamekî ji rôxistina Hamasê, ji aliyê leşkerên Îsraîl ve hatibû kuştin. Li ser vê bûyerê, dotira rojê aligirêne rôxistina Hamasê, piştî nimêja serê sibê, bang li gel kirin ku dest bi grevê bi-

kin. Li ser vê yekê gel dest bi meşê kirin. Leşkerên Îsraîli jî, êrîşê meşvanan kirin û di nav herdu alian de şer dest pê kir. Li gor agahiyêne ku ji nexweşxaneyen herêmê têne, zêdeyî 50 kesi birîndar bûne û pirraniya bîrîndaran, ji zarokên 12 salî biçuktir in.

Li ser van bûyeran, gel ji delege û nûnerên xwe daxwaz kirin ku, besdarî Hevdîtinê Aştiyê nebin.

### HEVDİTİNÊ AŞTIYÊ DI 27'Ê NİSANÊ DE

Hevdîtinê Aştiyê ku di nav dewletên Ereb, Filistîn û Îsraîl de didomin, bi hin daxwazên RRF (Rôxistina Rizgarriya Filistîn) heftiyekê bi paşket. Li gor ku hatibû beyankirin, dê ev hevdîtin di 20'ê Nisanê de pêk bihatana. Hevdîtinê Aştiyê bi sirgûnkirina 450 Filistiniyan ku, Îsraîl ew di Kanûna 1992'an de ji nav erdê Îsraîl aveti-bûn, rawestiyabûn. Ev lihev-rûniştin dê bibe yê 9'an ku di nav dewletên Ereb, Filistîn û Îsraîlê de pêk têne. RRF çend roj berê beyan kiribû ku, hefta Îsraîl rê li Filistîniyên sirgûnkiri veneke, dê besdarî civîna 20'ê Nisanê nebe. Li ser vê yekê dewletên Ereb û RRF li Şamî civînek pêk a-nîn û ji devê Serokê RRF'ê Yaser Arafat û Wezîrê Derve yê Sûrî Farûk El-Şarra hate beyankirin ku, dê Hevdîtinê Aştiyê di 27'ê Nisanê de li Washingtonê ji nû ve dest pê bikin.

## GOTIN



Yaşar Kaya

### Kurdnasî

**F**ilozofê Yewnanîstana Kevin A-rîsto dibêje ku: "Berê, xwe binase". Yani ez kî me. Heta mirrov xwe nas neke, nikare tiştekî û tu kesî nas bike. Em dikarin ji Kurdnasiyê re bibêjin Kurdolojî. Di nava Kurdolojîye de, sosyolojiya Kurdan ji heye, sosyo-antropolojiya Kurdan ji heye. Gelo Kurd xwe nas dikan an na?

Em Kurd xwedî neyar in. Gelek neyarê me hene. Lê neyarê me yê herî mezin, nezanî ye. Kekê Osman Sebî di helbesteke xwe de wiha dibêje:

Welle tu jan i/ Tu jana giran i/ Navê te nezanî

Me heya niha ci kişandibe, ji nezaniyê kişandiye. Ne Ereb, Ecem û yên din, mîna nezaniyê zorê nedane me. Nezaniyê dil û hinavê me xwariye. Ji nezaniyê xof ketiye dilê me. Em bûne pepûk, em bûne bindest, em bûne gelê ketî.

İro jî em ji zanebûnê hez nakin ku

em bêne rêza miletên dinê. Em bûne koleyê nezaniyê. Gunditîyê xwîna me vexwariye, çavê me kor kiriye, em li paş mane. Dîsa jî em şer nakin, em bi ser nezanî û gunditîyê ve naçin. Rast e, em giş zarokên gundiyan in, kêm ji me bajarı ne. Lê di vî zemanî de divê Kurd jî bê kîmasî zanibin ka bajarîbûn ci ye, diplomasî ci ye, siyaset ci ye, a-borî ci ye?

Em dibêjin, "Berxwedan jiyan e". Rast e. Lê şert û şurtên jiyanê ci ne? Divê em bînin cih, çare nîn e. Jiyana me jî divê mîna jiyanâ gelên dinê be. Kurdnasî bi van gotinan naqede. Kurd xebatkar in an na? Kurd bi ci dizanî?

**Em dibêjin, "Berxwedan jiyan e". Rast e. Lê şert û şurtên jiyanê ci ne? Divê em bînin cih, çare nîn e. Jiyana me jî divê mîna jiyanâ gelên dinê be. Kurdnasî bi van gotinan naqede. Kurd xebatkar in an na? Kurd bi ci dizanî? Dinya ber bi hîvê çû hat, evqas icat hene, ci yên me di nav vê teknolojiyê de hene?**


Divê em bînin cih, çare nîn e. Jiyana me jî divê mîna jiyanâ gelên dinê be.

Kurdnasî bi van gotinan naqede. Kurd xebatkar in an na? Kurd bi ci dizanî? Dinya ber bi hîvê çû hat, evqas icat hene, ci yên me di nav vê teknolojiyê de hene? Em dê welatê xwe çawa ava bikin. Baraj (bendav) û pir çawa têne çêkirin? Ev giş karên li pêşîya me ne?

Em Kurd bi qîmeta saet û deqîqeyan dizanî an na? Jiyana me çawa ye? Li mal, li cihê xebatê em ci dikan? Gundî li gundan ci dikan? Bajarı li bajaran ci dikan? Zeneatkar li karxaneyen xwe çawa dixebeitin? Kî bi vana dizane? Divê beriya her tiştî, em xwe nas bikin. Ez kî me? Ez ci dîkim? Ez ji ku derê têm, dicime ku derê? Ci rî li pêşîya min e? Em van tiştan giş berhev bikin, em dikarin bibêjin ji bo jiyanâ Kurdan filozofiya Kurdan ci ye?

Kurd, ji xebatê hez nakin. Li gorî min ev wisa ne. Lê ji xeberdanê zehf hez dikan. Kurd ji dinê gelek kêm fêm dikan. Gelek gîlî û gazinan dikan, lê ew bi xwe pak naxebeitin. Li ser jiyanâ me, li ser rîşa me, kesî heta niha tiştek nenivisiye. Bi van peyatiyan tiştek nabe, tu tiş naçê serî. Ji ber vê yekê, em dibêjin pêşî xwe nas bike. Xwenaskirin şertê pêşveçûyînê ye jî. Berxwedan jiyan e. Lê jiyan ci ye? Ji bo jiyanê serfiraz û azad em dê çawa bixebeitin? Zanîna vê ji me re şert e.





# ÇI GUHERÎ?

Parçekirin û parîkirina Kurd û Kurdistanê, ya ku ji aliye çar dewlet, çar çand û çar rejîman ve hatîye kirin; bextreşîya herî mezin e ji bo gelê Kurd. Ev bextreşî, tesîra xwe li ser têkoşîna gelê Kurd ji kiriye û ji bo yekîtiya neteweyî bûye astengeke mezin.

Ji sedsala 18'yan û vir ve, serhildanen ku li Kurdistanê cêbûne, an bi timî an ji bi serkeftinên biçuk û bêtremen têk çûne.

## CIHÊRENGIYÊN CIVAKÎ DEWLEMENDÎ NE

Sebebê van tekçûyinan ên herî mezin ew bû ku, Kurdan tu carî nikaribûye yekîtiyeke neteweyî ava bikin. Eşîrtî, mezhep, qewmîyetî, dîn û ferqiyetîn zara-vayan, di maneyekî dê dewle-mendiya çand û sosyalîya Kurdistanê ye. Lî dijmin van ji kirine navgîn û li gor berjewendiyen xwe li diji gelê Kurd bi kar anîne. Ferqiyeta çinayeti û tesîra rejîmî ji, li ser vî awayî rola xwe listiye. Ji bili van, gelê Kurd her tim bi hîleyen şer û hîleyen qesran ên Osmanî û Eceman xapiyane.

Di serhildanen klasik ên ku li Kurdistanê cêbûne de. Kurden E-lewî û Kurden Sûnî, Zaza û Kurmanç. Miliyan û Bedirxaniyan. Başûr û Bakuriyan an ji Bakurî û Rojhilatiyan tu carî alîkariyek xurt bi hev re nekirine. An alîkariyek gelek pîfîlîk cêbûye, an ji her tim bêdeng û çavgîrlî mane. Ev rewşa Kurdan, dagirkirên Kurdistanê ji her tim bi kar anîne. Fitne û fesadî kirine nav gelê Kurd û ji bo yekîtiya neteweyî ya gelê Kurd, astengiyê mezin çekirine. Ev rewşa û leyistikên siyasi, tenê li ser gelê Kurd nehatîye kirin. Di sedsala 19'an de van leyistikana li Erebistanê. Azerbey-

canê -ku di bin destê İngiliz û Fransızan de bûn- û gelê din ji hatîye kirin. Weki din gelek gelên gerdûnê (dinê), ji aliye da-girkeran ve, hatîye parçekirin û gelek caran ji bi hev re dane şer-kirin. İro ji Ereb bûne 17 dewletên ji hev cuda û gelek dewlet ji bakur û başûr an ji rojhilat û rojavayen wan ji hev cuda ne. Siyaseta kolonyalîstan a klasik a par-çe bike û bi rîve bibe (böl-yonet) bi vî awayî ketiye jiyanê.

Li Kurdistanê ev politika bi a-wayeke hovîti hatîye meşandin. Her tim xwestine ku, gelê Kurd bi hev bidîne qîkîrin. Ji ber vê sebebê di maneyekê de. dîroka Kurd kirine dîroka şerê biratiyê û xiyanetê. Ev xiyanet û şerê xwebixutiyê, di dîroka hemdemî ya Kurdistanê de êdî zêdetir hatîye bikaranîn. Di dema ku gelên gerdûnê têkoşînên xwe yê neteweyî bilind dikirin, gelê Kurd ji, li aliye hîzîn pozber (reqîb) têk bi-karanîn. Wan bi hev re didin şer-kirin û li ber yekîtiya neteweya Kurd dibin astengeke mezin.

Rewşa hin rîexistinê Kurdu, ji gel dûr bûn û baweriya wan bi wan tunebû ji, rî li ber bikaranîn û dijmin vedikir.

Serê ku di navbera PDK a İranê û PDK a Iraqê û dîsa şerê di navbera PDK a Iraqê, YNK'ê û PKK de, heya sala 1988'an domiya, bi sedan pêşmerge hatîne kustîn û PDK a İranê, ji aliye Iraqê ya Iraqê ji aliye İranê ve ha-te bikaranîn û wan bi hev dan serkirin. Li rüpelîn dîroka Kurdistanê yê herî trâjîk, bi vî awayî rüpelek nû zêde bû. Li bakurê Kurdistanâ ji bi derketina PKK'ê re hemû rîexistinê Kurd êris bi-rin ser PKK'ê û di van êrisan de ji xwîna gelek soresgeran hate ri-

jandin. Di dîroka Kurdistanê de, şerê xwebixutiyê ya dawî û herî mezin, di dawîya sala 1992'yan de çebû. PDK û YNK ji aliye dewleta Tirk ve li hemberî PKK hatîne fitnekirin, bikaranîn û bi alîkariya dewleta Tirk, ji bo imhakîrinê êrisêk mezin birin ser PKK'ê. Ev şer 45 rojan domiya. Di vî serî de ji xwîna bi sedan pêşmerge û gerîla hate rijandin. Dewleta Tirk ji bi balefirêن xwe û li piş tanq û topên xwe hîzîn Kurdistan Başûr birê xist. Heya vê demê ji ev rîexistinê Kurd hev û dijmin ilan kirin.

## REWŞA RÎEXISTINÊ KURDISTANÎ

Yekîtiya neteweyî li aliye, hînek ji wan surû dane destê dijmin û ji bo qîkîrina yê din têkoşîn dan. Bê guman ev girîng e ku mirov zanibe, kî li hemberî kî û ji bo ci şer kiriye, an ji dane şer-kirin. Lî dema mirov ji welatekî din, ji Enquerê, Tehranê, Bexdayê an ji Washingtonê li Kurdistanê dinêre ditina dimena (manzara) şerê navîn, şerê xwebixutiyê êdî girîng e. Dema ji van navendan li Kurdistanê tê nihîrtin, dimena ku dixwazin bibîn ey e. Bê guman di vê rewşa Kurdan a bextreş de, tenê şerîn leşkerî nîn in. Rîexistinê Kurdan ji hemû rîexistinê gerdûnê behtir ji hev dûr ketine û ji hev parce bûne. An ji, ji welatê xwe qetiyane, çûne we-latê Ewrûpa, bûne mîna mîsyôneren wan. Rîexistinê ku ideolojî û siyaseta wan gelek nêzî hev in: an ji koka wan yek e ji, nehatîne kîleka hev, bi hev re rûneniştine û bi hînek sebebîn sûnî, jiyanâ xwe bi ser û pêvçün derbas kiri-ne. Ev rîexistinê ku dûrî gel û têkoşînê mane, di nava pêvajoye

de ketine rewşa sirka ku zirar bi-de kûpê xwe. Têkiliyên rîexistinê Kurden ku her yek li parçeyek Kurdistanê ye ji, tim nebas bûye. Ev rîexistin bi hev û du re dijminatî nekirine: lê mixabin dostanî ji nekirine û timî ji hev û du dûr bûne. Ji bili van ji, di nav van herdu salen dawî de ji, hin rîexistin olperest; ji alî dijmin ve hatîne bikaranîn û ji paşve êrisî mirovîn welatparêz kiri. Di van êrisan de, bi sedan welatparêz şehîd ketin. Ev rîexistin olperest ku, ji xwe re dibêjin em radî-qal in bi rengekî gelek vekirî ji aliye dijmin ve hatîne bikaranîn û ev rewşa hanê, pozê wan ji neşewitand. Di bin navê İslamiyet de, bi rengekî çavşorî destê xwe kirin xwîna hemwelatiyê xwe û gelê xwe. Mixabiniyek mezin e ku, van qatilan ji nav xorten Kurdistan zar û reben hatîne hilbi-jartin û bikaranîn. Di dîroka Kurdistanê de gelek rîberen gelê Kurd, herweki **Bedirxan Beg, Eli Şer, Seyid Riza, Şêx Seid** û gelek ên din ji aliye endamîn malbata xwe ve an hatîne kuştin, an dane girtin an ji hatîne xapandin.

Riya ku ber bi yekîtiya neteweya Kurd ve dice, dijmin timî xwestîye ku vê riye bi dek û dolabîn mezin û barbarîyên mezin bibire. Ü gelê Kurd timî di we-latê xwe de bi destê birayê xwe hatîye kuştin. Ev metod ji bo dijmin êdî paqîj û bi kar bûye

## DÎROKA KURDISTANÎ BI PKK'Ê RE HATIYE BEREVAJIKIRIN

Serê cekdarî yê PKK'ê ku, ev neh sal e didome, dîroka gelê Kurd ku serserkî dicû, da rawestandin û ji bo yekîtiya neteweya

Serê cekdarî ya PKK'ê ku, ev neh sal e didome, dîroka gelê Kurd ku serserkî dicû da rawestandin û ji bo yekîtiya neteweya Kurd bû kevirên bingehîn. Rewşa rîexistinê Kurd, têkiliyên wan û bi hev re ev bûn. Di sala 1993'yan de ji bo guherti-na vê rewşê demeke nû dest pê kir.

Kurd bû kevirên bingehîn. Rewşa rîexistinê Kurd, têkiliyên wan û bi hev re ev bûn. Di sala 1993'yan de ji bo guherti-na vê rewşê demeke nû dest pê kir.

Dawiya şer, peymana navbera PKK, YNK û PDK'ê ji bi vê dema nû bû gava yekemîn. Gelê Kurd ên Başûr û Bakur di Serê Başûr de reaksiyonâ xwe li hember aliye neheq, aliye ku hatîne listika dijmin bi reaksiyonâ xwe dane xuyakîn. Pêşmergâyî ku di şer de bûn ji, nedixwestin ku şer bikin û gerîla ji li hemberî wan diparastinê de bûn. Bi fitnebazîyên hin kesen xayîn ên Başûr, dewleta Tirk ket nava erden basûrê Kurdistanê. Ev ji di nav Kurden Başûr de bû sebebî reaksiyonâke mezin. Di dû şer re daxwaziya aştiyê yê gelê Kurd bû sebebî ku hîzîn Başûr, têkiliyên nû bi PKK'ê re deynin. Peymana ku dewleta Tirk û hîzîn Başûr bi hev re çekiribûn ji, ber bi têkçûyînê ve dice.

Pêvajoya nermbûnê ku pişti peymana PKK, YNK û PDK'ê dest pê kir, ji bo yekîtiya neteweyî bû gava yekemîn. Ev pêvajoya di nav aligirê rîexistinê Başûr ên din de ji dest pê kir. Ji bili basûrê Kurdistanê pêvajoya ku nû dest pê kiriye sivik dimeşî ji daxwaziya gele Kurd a ji bo yekîtiye pêşve dice. Daxwaziya dewletek neteweyî rî li ber berjewendiyen eşîri digire û kesen ku dixwazin serokatiya xwe ya eşîri bidominin, xweliya bin piyên wan dişemite. Siyaseta dewleta Tirk û Iraqê ya ji bo jihedvîrxistina gelê Kurd, edî tu itibar nabîne. Bê guman dema em van tiştan dibêjin, nayê wê maneyê ku, li basûrê Kurdistanê her tişt sere rast e. Lî belê li wir ji bo yekîtiya neteweyî pêvajoyeke nû dest pê kiriye. Di vî warf de ji, tiştê herî girîng ew e ku, ev bi daxwaziyen welatparêz Başûr cêbîbe.

Peymana ku li dû şer, di nav PKK'ê û hîzîn Başûr de çebû, bû sebebî ku PKK li paytexta basûrê Kurdistanê, di warê siyasi de cihê xwe bigire. Ev rewş li hember temamî zordestiyen Enquerê û aligirê wê pêşve dice. PKK li basûrê Kurdistanê, bi rengek qanûnî-meşrû, di warê siyasi û leşkerî de bi hêz, tevi jiyanê bu. Li basûrê Kurdistanê êdî bêyi PKK'ê mafen jiyanê ji tu hesabî re tune. Ev rewş xwe di temamî têkiliyân de nîsan dide. Sebebê rola ku Celal Telabanî di messaja Sekreterê Partiya Karkeren Kurdistan Abdullâh Öcalan de şand ji Enquerê re leyist, ne tesadûf bû û ne ji bo daxwaziyen birayen wî yê Bakur bû. Bi taybeti ev têkili bû. Serrawestin ji bo daxwaziyen hîzîn basûr ku dixwazin problema bakurê Kurdistanê bi riye siyasi bîn çareserkirin û dewleta Tirk edî nekeve nav erde Basûr ji girîng e. Ev pêşvecûn dewleta Tirk tu carî hêvî û daxwazî nedîkir. Ev ji dide xuyan ku, dewleta Tirk edî nikare rî li ber pêşvecûn bigire û hin tiştan bike bin kontrola xwe.



Mirovekî birûmet xebata (berhemâ)  
Yezdan a herî esil e.

Alexander Pope

# De bidê ha ez nêmerda

Yew (jû) dew da Kurdistanî di yew lejik (lajek), may û pî xwi (xo) benê. Yew melbata (aile) zaf (zof) feqîr bi. Debera jîni nêbinê, jîni (yîni) zár-zor îdarê xwi kerdênê. Yew nêweşî da (nêweşîya) giran var a. verê pî jê dim ra may jê (yê) mirena. Wextona ki may û pî jê mirenê lajik teqrîben diwiyes (12) sere beno. Merdîş may û pîrde jê ra pey. o û yew herê xwi manenê. Sewna (zewna) ne yew ciy, ne zi mîrdimê (aqrebê) jê estê. Kirr qali (qise) yanî bêkes bi.

Der û cîranî naşt-daşt bide hewniyenê. Roji hewtan, hewtey aşman, aşmî serran fetilnenê. Lajik beno xort. Sexletê jê cewerî sero nêmaneno. Tuliki hêdîna tadano, naşt-daşt dormedê keynan di hokan dano xwi û qirfan fineno bide. Welhasil heqdê xwi ra vejiyeno. Tay wext, zaf wext nast-dast enbazê jê yê xotî zewinenê, benê wayîri keyî û kulfetî.

Rojana yew rojêdo Payizî yo. Qandê hazireya zimistandê giranî bi qiflan xortî heranê cil kenê, şefeqê coser ra ver a xwi danê ko şonê êzman. Eno lajik zî xoran reydi şonô êzman. Roj bi roj hewşde keydê xwi di êzmanê xwe pêsernano. Derê hêqîn hasil beno ki êzimê jê qîmê zimistandî kenê. Lajik rojê kê dê xwi di ronistewô, bêkesêya jê, may û pî jê kuwenê jê virî, pîz jê je veseno vano:

- Ax bêkesey ax.. Rana ku weno xeyalan miyan şono. Se redê xwi di yew pîlan virezeno. Vano: xule ez go (do) çend roji

keye (çeye) ra nêvejiya, belkî pîzê der û cîranan bi mi veşo, vajo ez keyna (çeyna) xwi biderda. Lajik dest bi pîlandê xwi ke no. Hirê-çêher roji kê dê xwi ra nêvejiyeno. Rojê cîranê jê cenida xwi ra vano:

- Here cenêkî! Eno cîranê ma çend rojiya qet tebera niyaseño, ti vana cay xwi rê şyo xebat mebat? Ceniya jê vana:

- Mérdek, xule eno çend roji yo çimê mi zî ta nêkewto. Cay zere di nêmîro. Tek yew mîrdimo, bimro zî çew pînêhesiyeno. Mérdek veýnda lajdê xwi dano tira vano.

- Lajê mî şo bidi berdê cîrandê ma ro hela veyni keyedo yan nê. Lajê mîrdeki şono dano berdê cîrandê xwi ro, hewniyeno ki veng tira nêvejiyeno, rayna te pa agêreno şono keye pîrde xwi ra vano:

- Bawo! Mi da ber ro çikesî cewap nêda. Eno nabêni di lajik zî, xwi niyîn cayan miyan di pûc keno, vano: xule pîlanê mi te piş. Enkay gede şono pîrde xwi ra vano, naro pî jê yeno. Cenêk mîrdeki xwi ra vano:

- Mérdek, hela ti wardi şo, cay cîranê ma pey berî di nêmîro? Mérdek wardeno şono berdê cîrandê xwi ver, berêjê ceneno. Veyndano veýndano hewniyeno çikes cewap nêdano. Mérdek hêdîka ber akena şonô zere, veýneno ki lajik ha cayan miyan do. Dîrê vengî veýndano, vano:

- Ciran, cîran... hewniyeno ki veng cîrandê jê ra nêvejiyeno.

destê xwi bide kuweno, hewniyeno rana tira nêvejiyeno. Mérdek xwir xwi rê niçeno vano:

- Tiye... He, feqîr merdo. Rana tepe agêreno şono keye (çeye). Ceniya jê tira persena vana:

- Mérdek, cîranê ma keyed bi yan nê? Mérdek vano:

- Keyedo, Lakim merdo. Kam ci zano belkî eno çend roji yo zî merdo. Feqîr xwi rê cahil û ciwan bi.

Mîrdeki yew bi didi nêkeno şono xeber dano malay. Mala şono elay veydano. Vengan ku weno dew miyan, dewijî şonê mezel. Cenîyê dew zî kirêsiyene kîdê lajik dê merdiy. Cenîyê ki keydê lajikî di kom bîbiy, her yewê cay hêson war kenê û bermenê. Taynay, pî û gedandê xwinê merdanê, tay zî lajikî rê verkewtê ermeynê. Eno nabêni di ceniyandê kombiyayana yewê, va:


Tiye.... He, cahil û ciwanê di merd. Feqîr xwi rê ezebey di merd. Ocaxê jîni kor bi şî. Ki mi ra bivatê keyna xwi bidi mi, xule mi aynê bide. Ay cenîyanê bînan hemin yew fek ra va:

- Xule, ma kamî ra bivatê, ma keyna xwi daynê bide. Tiye.. He, aqîr û mîhîr cahil û ciwaney di merd şî. Lajik zî enê qalan hemin eşaweno. Eger enê cenîzûrî nêkenê se, ez kamderi ra vaja, go eyna xwi bido mi. Lajik hama miyana hol bena vano:

- Eger şima zûrî se, bidê ha! Ez nêmerda.

Mihem Himbelij

Jûjî...



Doğan Güzel

# TİR

Musa Anter



## TC dewletî û dewletên Tirkan yê nû

Lî gundê me di wextekê de maqûlekî çeleng hebû. Navê wî Biroka bû. Ez ne gihamê lê min gelek peyên wî dîtin. Hema diecibandin. Mîr bû, egit bû. Paşê hat kuştin. Lawekî wî hebû. Navê wî Berekatê Biroka bû. Yanî Berekatê lawê Biroka. Ev lawik qumarbaz, bêkêr û serseri bû. Temamê pêşveçûna wî digot, "Ez layê Biroka me." Lî kesî guh nedidayê, di gunehiyê de kesî bi tiştekî ne dihesiband.

Li gundê Qûze xwarzîkî wî hebû. Ew jî wek Tirk dibêjin gerî zekali yanî ew jî xerabe bû. Li gund xwe bê cir dikir digot: "Ez xwarzîyê Biroka me." Lî gundiyan zanîbû ku tu Birokîtiya wî nemaye, ser û guh lê hûr dikir. Dihat Nehyê cem xalê xwe Berekat digot: "Xalo filankes filankes li min xistin û tadê li min dikin." Berekat digot: "Ma ez qebûl dikim ezê bavê wan bişewitînim. Metirse ez xalê te me", felan fişan. Nermo diçû Gund car din xwe neheq û mekroh dikir gundiyan car din têr dar dikir. Nermo car din dihat cem xalê xwe. Xalê wî ji çirtan pê ve nikaribû tiştek bikira. Dikir zirt zirt û Nermo jî lêxistina xwe dixwar. Rojekê car din wiha bûbû, layê Berekat İdrîs got: "Yabo te ev reben kuşt ku nikari tiştekî bike tu zirtan jê re dike û ew jî dihere xwe li xelkê mekroh dike ev têr serê wî, dev ji rebe-no berde."

Tarixçikî Ingîlîz navê wî Arnold Tombey e, dibêje: "Tirk bi tarixê nizanîn, ku li wan teng bibe karin Hezretê Nebî Silêman û Qanûnî Sultan Silêman bikin yek, tenê jî navê wan." Edî ez dinêrim i-ro Tirk karin Silêman Demîrel jî têxin nav wan. De ica wê çawa keroşk, rovî û şer bi hev re biçêrin?

Ez dinêrim hikûmeta me û ev dewletên ku nû kirî çêbîbin, aynen wek Berekat û Nermo ne. Serekê hikûmeta me di cih de dibêje, "Weh ma em qebûl dikin weleh emê işekî bînin serê Ermeniya ji ferma wan ya berê xerabtir." Lî Ermenî zanîn ku em wek Berekat in û rebenen Azerî û Nexçîwan nizanîn bê em ci nin. Xwe mekroh dikin. Ermenî li devê wan dixin, paşê Silêmanê me dibêje: "Ma yabo em nikiran bi Ermenîyan, temamî dînyayê li pişta Ermenîyan e." Eh Silêman ma ew serê te yê mezin û ew şefqa te ya ku başçawîşan gelek caran li nav çavêne xist, çîma tê berê nizanibe ku tu kî yî û Ermenî kî ne? Belê eyba zilamîn me yên dewletê ew e ku, zemîn û mekîn tevlîhev dikin. Tarixçikî Ingîlîz navê wî Arnold Tombey e, dibêje: "Tirk bi tarixê nizanîn, ku li wan teng bibe karin Hezretê Nebî Silêman û Qanûnî Sultan Silêman bikin yek, tenê jî navê wan." Edî ez dinêrim i-ro Tirk karin Silêman Demîrel jî têxin nav wan. De ica wê çawa keroşk, rovî û şer bi hev re biçêrin? Vêca li cem Tirkan fikra tarixî ev e. Ma Silêman ez feqîrekî li dera hanê me, ez zanim ku hikûmeta Tirkîye nikare elaqê xwe ji Nexçîwan û Azerbeycanê bîne. Tuyê çîma nizanibi û tuyê zirtan ji van feqîrân re bikî, serê wan têxe belyâ. E min niha ez gunehê evqas kuştiyê Azerbeycan û Nexçîwanê guneh û xwîna wan ez dikim stûyê Silêman Demîrel. Hanî carna dikeve mehke-man zilamekî dewlemend i mezin, keçikek feqîrî bi namûs dilevitîne, di zimanê hiqûqê ya Tirkîye de dibêjin ixfalkirin. Li gor wîjdan, qeneeta min ew e ku, hikûmeta Tirkîye ku ji xwe pêşî gerek serekê hikûmetê Silêman Demîrel ixfalcî ye, feqîr û fiqarê Kafkasya ixfalê kirine. Eh di temamî qanûnî dînyayê de, cezayê ixfalê yanî xapandinê mezin e. Mesela ku imkanan min hebe, ji bo vî sûcê ku bi hezar anîsan ji mala xwe derketin, hatin kuştin û bi çolê ketin; sebeba wê Silêman Demîrel e. Minê berî Leyla Zana, Silêman Demîrel idam bikira.

*Qetlîam, talan, koçberkîrin, an jî cerdevanî*

# TC gundan jî mirovan paqij dike

**TC. tevî hemû gaziyê astiyê, siyaseta xwe ya qirkirinê ya li hember gelê Kurd didomîne. Hêzên leşkerî bi alîkariya cerdevanan jî, bi hemû hêza xwe ve pêkutiyê xwe didomînin. Li gundê Sasonê zêdeyî 15 gundê ku cerdevaniyê nepejirandine, hatin valakîrin û xelkê van gundan koçber bûn. Li deverên din jî rewş yek e û zilma TC'ê didome.**

**Navenda Nûçeyan-** Li gundê Girê Hecî Faris, hêzên leşkerî hovîtiyê li ser gundiyan pêk anî. Gundiyan bi îşkence û bi zorê kîrin cerdevan, xani hilweşandin, xesirandin û dewarê gundiyan kuştin.

Hezên leşkerî yên qereqola Tepe ku giredayî Tabura Cendermeyan a Bismilê ne, di 20.4.1993'yan de, saet di 4'ê serê sibehê de, cerdi ser gund kirin. Gundiyan Girê Hecî ji Faris aliyê leşkeran ve li meydana gund hatin civandin û işkencê, pêkutî û tehdeyeke hovane li wan hate kirin. Bi hinceta ku gundi gerilayan dihewînin, malen gund yeko yeko ji aliyê leşkeran ve hate gerandin. Pot û pertal, eşyayê giranbuha yên gundiyan hatin talankîrin. Di vê navê de, çar xaniyê gund jî, ji binî ve hate hilweşandin.

Gundi ji bo ku cerdevaniyê qebûl nekirin, li wan îşkence hate kirin û ku nebîne cerdevan dê, tev werine kuştin. 13 kes jî hatin girtin.

Dotira rojê, hêzên leşkerî ji nû ve davêjin ser gund û li gund

qereqoleke seyar ava dikin. Ji bo bi gundiyan cerdevaniyê bidin pejirandin, tehde, xedr û pêkutiyâ xwe ya li ser gundiyan didomin. Ji ber van çespînê dewle te gelek kes gund şemirandine û koçberî deverên néz bûne.

Gundê Hecî Faris beriya çespînê dewletê, 55 xane û 500 kes tê de mirov hebûn. Niha yên ku di gund de mane, di bîne xedreke mezin de ne.

Li gorî peyvinê gundiyan ji hengî ku M. Şîrîn Tekîn hatiye kuştin ji aliyê dewletê ve, cerd û pêkutiyâ hêzên dewletê li ser gund zêde bûye û bi demen kin, ev kirin her domiyane. Her tim ji teklifa cerdevaniyê li gundiyan hatiye kirin.

M. Şîrîn Tekîn xwendekarê Zanîngeha Wanê bû, di sala 1987'an de li Wanê, ji aliyê "kesen tarî" ve bi kîran hatibû kuştin. Her wiha wek mirovek welatparêz dihat nasîn.

Ji 13 gundiyan ku hatibûn girtin, pênc kes bi sozê ku cerdevaniyê qebûl bikin hatin berdan. En din jî hê girtî ne. Kesê ku niha girtî ne ev in: H. Selim



Piştî şerrawestinê ya PKK'ê dewlet cerd û pêkutiyê xwe yên li ser gelê Kurd didomîne. Wêneya li jor, wêrankirina gundê Kurdan nişan dide.

Tekîn, A. Celîl Karagöz. (Ev herdu kes xaniyê wan hatine hilweşandin), Kudretîn Tekîn, Mehmet Tekîn, Şehmus Karagöz, Kasim Karagöz, Ethem Karagöz, (Ev her pênc kes xanî û malê wan hatine xesirandin) û Halîl Güneş, ev ji eşyayê wî hatine talan kirin.

Li ser lêdan û işkenceye leşkeran, evênu ku sozê qebûlkirina cerdevaniyê dane jî ev in: Şerif Karagöz, (niha cerdevaniye dike, xaniyê wî ji aliyê leşkeran ve hatibû pelaştin) Şehmûs Çelebi (cerdevaniyê dike, ew ji eşyayê

wî zerarê dîtine.) H. Rifat Karagöz (Bi sozê ku wê du lawê xwe bike cerdevan tê berdan. Lî kurên wî cerdevaniyê napejirînin, gund dişemirînin) Nusrettîn Baran (cerdevan e û eşyayê wî hatibûn xesirandin) û A. Rahman Kaya (soz daye ku wê bibe cerdevan, piştî ku hatiye berdan red kiriye.)

Li gor agahiyênu ku ketine destê me, muxtarê gund Şemsettin Güneş û İzzettin Çelebi bi dildarî û bêyi pêkutiyen cerdevaniyê qebûl kirine û bi leşkeran re, cerdi ser gundê xwe kirine.

Li ser vê çespîna gundê Girê Hecî Faris a Bismilê, sazi û rôxistinê demokratik ên Amedê dengê xwe bilind kirin û ev kîrinê hovane yên hezên leşkerî protesto kirin.

Rôxistin û saziyên demokratik, Tüm-Maliye Sen, Demir Yol-Sen, Tüm Haber-Sen, Sağlık-Sen, Tüm Sağlık-Sen û yên din rewşa Girê Hecî Faris wiha nirxandin: "Di dema şer-rawestinê de û ji aliyê din ve ku behsa rakirina "rêyeberiya taybetî" û pergala cerdevanan tê kirin, durrîtiya dewletê xwe nişan dide."

## Hem talan û hem jî tahrîbat

Cemê Feradê ji ber bermayıyê petrola xam tê gerâmkirin. TPAO (Şîrîkatiya Anonim a Petrolê Tirkiye) bermayıyê petrola xam ji heft qulyayê (birên) hildiberîne dirêje çeme Feradê.

Ji niha ve ji ber kirêtkirina çem, masî, dewar û pezên gundê der û dorê çemê Feradê, bi jariyê ketine. Wiha here ekolojiya çem û warêndorê çem ji ber kîrinê hêzên dagirker dê xera bibe.

Hezên dagirker ji aliyekî ve hebûn û dewlemeniyê Kurdistanê talan dikin, ji aliyê din ve ji ekolojiya wê xera dikin.

TPAO du sal berê li tengâ Çaylarbaşiyê di heft qulyayen de petrol difibû. Li vê herêmê mehê 20.000 wanîl petrol tê derxistin.

Li ser vê rewşê rayedaren TPAO'yê ji peyvînê fi-kare dikin. Li ser lêgerina rojnamevan, rayedarekî qulyaya Doğu Besîkî navê xwe nade lê wiha peyivîye: "Di demeke nêzik de, dê petrola dînyayê ji van bîran bê derxistin. Ev der reha Tirkîyê ya jînê ye. Ango ji ber ku çend masî dimirin em dê rabin hilberînê rawestinîn? Ev qet nabe."

## Berxwedana girtiyan

**Navenda Nûçeyan-** Grevê birçibûnê yên ku li girtîgehê Amed, Mûş, Mîrdîn, Ruha, Batman, Konya, Bûca, Çanakkale, Ceyhan û Amasyayê ev zêdeyî 2 mehan e didome, ji ber tewrê dewletê ku bi nûnerên girtiyan re rûnanin, dawî lê nayê û ev pirs çareser nabe. Girtî ji bi biryara ta ku mafênu wan li wan bê vegerandin, di berxwedanê de ne. Hin ji girtiyan, ji ber nexwesinê girtîng ew rakirine nexwes-xaneyan.

### GIRTİGEHA DIYARBEKIR

Greva birçibûnê, li Girtîgeha Diyarbekir kete roja 75'an. Nûnerên girtiyan Girtîgeha Diyarbekir Bedrettin Kavak û A. Hakkı Güven, li ser rewşa greva beyanekî dan. Di beyanê de bi kurtî ev dîtin cih digirin: "Li girtîgehê û destavâtina Wezreta Edaletê û bi pejirandina

mafênu girtiyan ev grev rawestinê. Lî ji bo dawîlêanîna vê greva me ku, ev 75 roj in didomin bi tu awayî riya hevrûniştin û çareserkinê ji aliyê dozger û rîyeberiya girtîgehê ve nayêne vekirin. Di nav girtiyan de, nexwesinê girtîng peyde bûne. Hê ji di çûnehata mehkemeyê de li girtiyan işkence dikin. Ên ku têne tehliyekirin ji, beriya berdan bi rojekê, ew dixine işkence-xaneyê û işkenceyên xedâr li wan dikin. Ev pest û pêkutî bi daxwazên wali û MGK'ê didomin. Rê li ber hevditina girtî û malbatênu wan têne girtin. Saetên hevditînê bi awayekî keyfi, kurt kirine. Dest datîn ser xwazînên girtiyan nexwes-xaneyê riya itirafkariyê didine ber wan. Ger rê li ber van işkence û zilman neyê girtin û ger mafênu me li me venegerînin, dê ev gre-

va birçibûnê heta bi hetayê bido-me. Em desteka hemû kesen ku ji xwe re dibêjin insan in, dixwazin".

Malbat û lêzimên girtiyan li Girtîgeha Diyarbekir ji, greva birçibûnê ya ji bo destekkirina zarokên xwe, li HEP'a Diyarbekir didominin û beyan dikin ku ta zarokên wan di grevê de bin, dê ew ji vê grevê bidominin.

Li aliyê din, pest û işkenceneyen bi vî rengî li girtîgehê Mîrdîn û Ruhayê ji didomin. Greva birçibûnê yê Girtîgeha Mîrdînê, ji 2 mehî bihûrî. Li Girtîgeha Ruhayê ji, girtî roja 22'ê Nisanê dest bi grevê kirin. Daxwazên girtiyan vê girtîgehê ji, weke yên girtîgehê din in. Li Girtîgeha Mîrdînê ji, girtî beyan dikin ku, ta mafênu wan li wan bê vegerandin û dawî li van işkenceneyan were, dê greva xwe bidominin



## NAVENDA ÇANDA MEZOPOTAMYA LI KURDISTANA BAŞUR

NÇM (Navenda Çanda Mezopotamya) ji bo li başûrê Kurdistanê ji şaxeke xwe veke, dest bi xebatan kir. Navenda NÇM'ê li Stenbolê ye. Demeke berê li Amedê ji şaxeke xwe vekiribû. Serokê NÇM'ê İbrahim Gürbüz, demeke berê li Enquerê vê daxwaza Navendê pêşkêşî Sêrokê YNK'ê Celal Telabanî kiribû. Celal Telabanî ji, erêniya xwe dabû vê projevê. Pişti vê hevditînê Rêveberiya Navendê, ji bo li başûrê Kurdistanê ji, şaxeke xwe veke dest bi xebatên xwe kir. Ji bo pêkanîna vê projevê, dê di rojêne pêş de heyetek ji Navendê biçe başûrê Kurdistanê.



## Li Kurdistanê heyetek piştgir

**Navenda Nûçeyan-** Heyetek ji Rexistina Efûyê ya Navneteweyî, Rojnamevanê Navneteweyî yên Sînor Nas Nakin û ji Evûqatan, di 16'ê Nisanê de hatin Amedê. Heyet ji 8 kesan pêk tê û bi mebesta piştgîriye hatine.

Di vê heyetê de avûqat, rojnamevan, bernamevanê, TV'ye û ji Rêxistina Efûyê ya Navneteweyî kes hene. Heyet di navbera 16 û 21'ê Nisanê de, li hêrêmê xebatên xwe bidomînin û encama xebatên xwe dê pêşkêşî konferansa Mafê Mirovan û Dijberî Şer bikin. Konferans di meha Hezi-

ranê de dê li bajarê Viyanayê ya Avusturyayê çêbibe.

Heyet bi serokatiya Av. Jan Fermon û Rojnamevan Benoît Moulin ve serî li Komleya Mafê Mirovan şaxê Amedê, rêxistina HEP'ê (Partiya Keda Gel) ya Amedê û buroya rojnameya Gündemê ya Amedê xistin.

Heyet bi rêveberên van rêxistinan re ket têkiliyê û li ser rewşa herêmê ji wan agahî standin. Her wiha heyet di dema serdana xwe ya rêxistina HEP'ê de, bi lêzimên kesen girtî û cezaxwarî re ku di greva birçibûnê de bûn ji tekili danîn û der barê rewşa wan ku kesen girtî û

cezaxwarî de agahî ji wan stand.

Heyet xebata xwe ya li ser rewşa girtî û cezaxwariyan, li ser rewşa rojnamegerî, rêxistin û saziyên demokratik, rewşa gelê Kurd bi rêvebirên sazî û sazendeyan re muleqat û kêşanê TV'ye kirin.

Kesen ku di vê heyeta ku ji bo piştgîriye vê geşta li dar xistine, navê çend kesan jê ev in: Av. Georges-Henri Beauthier (Belçika) Rojnamevan Benoît Moulin (Fransa), Av. Jan Ferman (Belçika), Edith Aerts (Belçika-TV). Michael Anglade (Fransa-TV)

## Li Eyaleta Amedê çûna leşkeriyê hate qedexekirin

Li Eyaleta Amedê, Konseya Leşkerî ya ARGK'ê bi belavokekê, çûna leşkeriya ordiya KT (TC)'ê li xortêne Kurd qedexekirin. ARGK a Eyaleta Amedê, bangî xortêne Kurd kir ku werin di refen gerila de leşkeriyê bikin.

Konseya Leşkerî ya Eyaleta Amedê, di 8'ê Nisanê de, bi belavokekê, li xortêne Kurd çûna leşkeriya ji bo Ordiya Tirk qedexekirin. Bi belavokê bang li xortêne Kurd hate kîrin ku, werin di refen gerila de leşkeriyê bikin. Di belavokê de, tê diyarkirin ku, ji sisiya yekî ordiya Tirk ji xortêne Kurd pêk hatiye û dê ji iro pê ve neyê qebûlkirin ku, xortêne Kurd di vê ordiya ku imhakirina Kurdan kiriye leşkerî bikin. Di dumahîka belavokê de wiha tê gotin:

"Ji sisiya yekî ordiya KT'ê xortêne Kurd in. Berê, ger ku xortêne Kurd neçûna leşkeriyê dîviyabû ku, welatê xwe biterikîn. Lê iro, hema hema hemû deşt û çiyayê eyaleta me, ne di bin destê dijmin de ne û dijmin bi tu awayî nikare bikeve vê hêlê.

"Divê êdî xortêne Kurd, di ordiya xwe ARGK'ê de leşkerî bikin û di refen ARGK'ê de bigihîje doza serxwebûn, azadî, şeref, namûs û dînê xwe. Divê tu malbat ên ku ji xwe re dibêjin, ez Kurd im, welatparêz im, heta insan im li dijî vê bîryarê dernekevin".

Di belavokê de tê diyarkirin ku, yê li dijî vê bîryarê dernekevin, dê bi pere û awayê din bêne cezakirin.

## Şadûmaniye 1'ê Gulanê li Amedê qedexe ne

Sendikayê karkeran, ji bo şadûmaniye 1'ê Gulanê destûr xwestin, lê Waliyê Rêveberiya Taybetî vê daxwazê red kir.

Cejna karkeren dinê 1'ê Gulanê, weke her carî, li Tirkîyê û li Kurdistanê bû sebebê gengeşiyên mezin. Dewleta Tirk, bi tu awayî rê nade ku şadûmaniye 1'ê Gulanê bi serbestî bêne lidarxistin. Ev ji dibe sebeb ku, her sal bi sedan mirov têne girtin, birîndarî û kuştin çedibin.

Li Tirkîyê, hê ji ne diyar e ku, dê kêt û li ku derê şadûmaniye 1'ê Gulanê li dar bikeve. Lewre Sendika û saziyên demokratik ji bo pîrozbahîyeke hevkâr, li hev û din nakin. Hin ji wan li gor daxwazên dewletê, şadûmaniye 1'ê Gulanê mehkûmê salonan dikan. Hin ji, li dijî vê dertêne û dibêjin em dê 1'ê Gulanê li kolanan pîroz bikin.

8 ji sendikayê Amedê ji, ji bo di 1'ê Gulanê de li meydanan pîroz bikin, ji rayedarên dewletê destûr xwestin. Lê Waliyê Rêveberiya Taybetî vê destûrê neda.

Li gorî ku xuya dibe, dê dîsa şoreşger bêdestûr dernekevin kolanan û dê dîsa di 1'ê Gulanê de xwîn bê rijandin.

## Konferansa PKK'ê ya Eyaleta Amedê pêk hat

Li gor agahiyêne ku ji çavkaniyêne gerila digihêne destê me, Konferansa Yekemîn a PKK'ê ya Eyaleta Amedê, di 3-17'ê Adarê de pêk hatiye.

Konferansa yekemîn, li çiyayê bakurê Amedê bi besdariyeke xurt pêk hatiye û di konferansê de bîryarêne girîng hatine girtin. Li gor agahiyêne çavkaniyân, di konferansê de, bi tundî li ser rewşa gerila û sala 1993'an hatiye rawestandin û şertêne nû hatine nirxandin. Di encama beyana li ser vê konferansê de wiha hatiye nivîsin:

"Sala 1992'ê bi giştî hate nirxandin. Li ser gavavêtinê 1993'an guftûgo pêk hatin. Bîryara xurtkirina rêxistiniya eniyê û ji rêxistiniya bêlükê, derbasbûna tabûrê hate girtin.

"Ev konferansa yekemîn ji bo me gelek girîng bû. Me piştî nirxandin û guftûgoyan, rewşa xwe ya şer, bi hemû awayêne wê ve danî holê".

# PÊNÛS

Amed Tigris



## Turgut Özal

**D**i nav me Kurdan de gotinek heye. "Mirî qûnzerîn dibe". Yanî ew kesê ku di dema jiyan xwe de, jê bi neqenci bê behskirin û dema dimire, behsa qenciyâ wi bikin; dibêjin, "Ew mir qûnbizer bû." Eynî mirov dema sax e, pîs e. Nebas e. Zikres e. Tîrsonek e. Bekoçixulo ye. Caş e... Lê, dema ew dimire rehmetî dibe ewliya. Dibe qehreman. Dibe dilovan. İro mirov dibêje qey, ev gotina pêşiyen Kurdan ku çend hezar sal berî niha gotine dibe ku ji bo Turgut Özai hatibe gotin. Ji bo vê yekê ji wek Turgut Özal re, ne bi tenê gotina qûnbizerîn, herwiha serbîri ji têr nake.

Heta do ji Serokwezir Süleyman Demirel heta serokê parlamento H. Cîndoruk, ji kernalistân heta dîndaran erd û ezman bi ser Turgut Özal re dianîn xwarê. Hemûyan bi devek digot, "Ew xayînê welat û mîlet e... Xanedan û sultân e. Serokê mafîya û şebekeyan e..." Werhesil, di zimanê Tirkî de çiqas gotinê xerab û nemayî hebûn jê re digotin. Di vekirina parlamento de nexwestin guhdariya axaftina wî bikin. Dergehê parlamento lê girtin.

Der û dor lê teng kîrin. Ji bo tengkirina berpirsiyaren wî biryarên By-Pass derxistin. Demirel û serokê partiyen din, çend car hewl dan ku wî ji serokatiyê biavêjin. Demirel digot, "Heger di parlamento de quweta me pê bigihê, em wî rojekê ji li Çankaya yayê nahêlin..." Partiya Erdal Înönü ji digot, "Çankaya şîşmani, işçî düşmani." Yanî qelewê Çankaya yayê dijiminê karke- ran e. Hefteyekê berî mirina Turgut, dîsa Süleyman Demirel wiha digot, "Ew Turgut, Serokwezirê Kenan Evren û generalan bû..." Heta roja ku ew tê de bimire ji rewş wiha bû.

**Belê, ew Özalê ku hefteyekê berê di seri de S. Demirel û yên din lanet lê dîbarandin, cima niha hezar rehme lê tînin? Mesele gelekî vekirî û zelal e. Dixwazin bi kevirekî du çûk bikujin. Bi mirina Özal gelê Kurd û Tirk bixapînîn. Gel ji dozê dûr bixin. Yanî bi gotina wan bi mirina Özal re "mutabeketa milî" pêk tînin.**

Lê, dema ku Süleyman Demirel xebera mirina Turgut Özal bihîst; daxuyanî da ku, "Ew qehremanê neteweyî bû." Serokê partiyen Tirkan ên din ji, bi hevdu re ketin reqabeta pesindayîna T. Özal. Di ziman û literatura Tirkan de çiqas sifatîn qenc hene hemûyan ji bo wî bi kar anîn. Ne bi tenê serokê partîyan, ji dem û dezgehîn dewletê heta yên şexsi û yên dîni, bi hevdu re ketin hemberî û pê birikê. Bi yek gotinekê ew kirin Atatürkê duymen. Dibêjin û dînîvisin ku, ew qehreman bû. Ew serokkomarê sivil bû. Demokrat bû. Ew dîndar bû. Ew humanist bû. Ew bû û ew bû... Dewleta Tirk wiha dest bi propagandayekê kir ku, bi mirina T. Özal Tirkîyê rakirin ser piya. Dewlet û hemû sermayedaren Tirkîyê bi hemû imkanen xwe ve, bi milyonan mirov li pey cenazeyê wî xistin rê. Ji büçük heta mezîn û ji her aliye ve medya Tirkîyê şîn kir. Li Enquerê û li Stenbolê jiyanê dan rawestandin.

Bi rastî T. Özal ci bû û ci ne bû?

T. Özal Serokê MESS'ê bû. Yanî serokê rêxistina kapitalistên herî mezîn bû. Ew xwedî û mimarî Biryareñ 24'ê Çîleyê bû. Yanî muhasibê Bankaya Cihanê û IMF bû ku li Tirkîyê milyoner bûn trilyoner. Xebatkar ji perîşan û derbeder bûn. T. Özal memûrê Kenan Evren û generalan bû ku, bi hezaran şoreşgeren Kurd û Tirk girtin û avetiñ zîndanan. Ew di işkencyen giran û nedîfî de derbas bûn. Turgut damezrevanê Waliyê Amedê bû û ordiya taybetî bû. Özal damezrevanî cerdevanê (caşen) Kurd bû. Özal ji nîvî bêhtir leşkerê xwe li Kurdistane bi cih kir. Ji 10 hezart bêhtir keç û xorîn Kurd da kuşin, Nexweşxaneyan tije birîndar û se- get kir. Girtîxaneyan tije Kurd kir. Wî, 2 milyon Kurd koçbarê Anadolê kir. Çîna karkerê Tirk belav kir. Înfaza şoreşgeren di mala wan de bi cih anî. Lê, divê mirov heqê rehmetî (!) ji nexwe, bi van kirinîn xwe re carek got, "Li Tirkîyê 12 milyon Kurd hene." Carek din got, "Dibe ku pîrika min ji Kurd be." Berî ku here mala bavê xwe Amerika dîsa got, "Ji bo Kurdan mirov dikare idareya federalî ji munaqeşe bike..."

Mirina Özal ji wan re bû hecetekê mezîn. Bi wesîta medyayê li Kurdistane doza neteweyî û demokratik dixwazin bidin jibirkirin. Li dijî doza Kurd a neteweyî û demokratik, yekitiyeke njadperest pêk tînin. Li Tirkîyê ji, bi vê yekê dengê karker û xebatkaran bidin birîn. Çinêñ xebatkar û muxalefet bifetisînîn. Ji ber vê yekê divê Özal, hem bi serbizîr û hem ji qûnbizerîn. Mesele ev e.

# Di çanda me de çar hêman

Zana Farqînî

Mirovahî hengî femberî xwe bûye ta niha, gelek tişten madî û manewî afirandiye. Dem hatiye tişten ku bi destê xwe afirandiye pê perizîye û ji xwe re kiriye tiştekî pîroz. Tiştekî ku jê nayê peyvandin, dest pê nayê kirin. Bi taybetî ji, ev rewş di warê manewî de her domiyaye û hê ji didome. Her civak xwedî taybetiyen bî vî rengî ne:

Heta em dikarin bê fikare bibêjin ku, her civat li ser nîrxen xwe yên manewî felsefeyekê, bîr û baweriyeke jî damezirandiye. Bingeha olan ji li ser wê rewşî danîne. Em dikarin bîr û baweriye olî, mîna dema mirovahî ya zarokatiya wî binirxînîn. Anglo ol, romana mirovahî ya dema tarîtiyê, nekemilandin û gihiştina mejiyê mirov e.

Em tev dizanîn ku, gelê Kurd geleki misilmankirî ye, ji ber xwe û bi hemdê xwe misilman nebûye. Beriya dema ku ola İslâmî li Kurdistanê bi darê zorê belav bibe, gelê Kurd mîna gelê Arî, bîr û baweriye Zerdeştiyê dihebandin. Her ol bi xwe re pergala dînûstandinê, hiqûqê, aboriyê, çandê û hwd. diafirine. Her çiqas gelek bîr û baweriye xwe û kevneşopiyen xwe bişemirîne an ji pê bidin şemirandin (terkandin) ji, bi carekî xwe nikare ji bandor û hîkariya jiyan xwe ya manewî, civakî, sincî (exlaqî) nirxdarazî û hwd. bifelitîne.

Mebesta min ew e ku, ez li ser car hêmanan rawestim. İro ji ev çar hêmanen ku di çanda Kurdi ya kevnare de hebûn, hene û di zargotina Kurdi de hebûna xwe diparêzin. Ew çar hêman ev in: **Agir, hewa, av û ax.** Ev hêman di felsefeya Yewnanen Kevin ta gelên Rojhilata Navîn de heye. Her wiha di Zerdeştiyê de û di Yezidîtiyê de ji hene. Ligorî bîr û baweriye kevin, dinya ji van çar hêmanan (elementan) çebûye.

Di pirtûka olî ya Yezidîtiyê de ku navê wê Cilwe ye behsa girîngiye ev hêmanen hanê tê kirin û



tê pejirandin ku, dinya li ser wan hêmanan ji aliye Xwedê ve hatiye avakirin.

Ez niha dixwazim di çanda Kurdi ya devkî de hebûna van hêmanan bipeyîtinim (tespit bikim). Ev hêman hem di nav Kurden Sunî, Elewî û hem ji yên Yezidî de di gotinê pêşyan de, di biwêj, klam, stran, çîrok, çîrcîrok, mamik, metelok û hwd. de hene.

Ji ber ku di nav van hêmanan de yê herî pîroz agir e, ez dixwazim pêşî bi agir dest pê bikim. Agir li gorî Zerdeştiyê ronahî ye, nûnerê Xwedê yê li ser rûkê dînayê ye, li hemberî tarîtiyê ye, tişten xweş û qenc di hebûna a- gîr de xwe didine der. Di nav gel de ji bo agir wiha tê gotin: "Bi a- gîr meleyizin dê agir xenîmî we bibe", "Agîrê binê şîr naye da- yîn", "Çavê min mîna agir bişewe".

Ji bo avê ji, dema ku av li ber male birije, "Av avahî ye" dibêjin. Li ser axê (erdê) ji dixwazim mînakekê bidim. Dema ku bîharê baran dibare û ax dînepixe ji dibêjin, "Ji axê vegeerin, ax avis e". Girîngî û pêwîstiya he-

wayê ji aliye me hemûyan ve tê nasîn. Ku ne ji hewayê be jiyan ne gengaz e.

Weke ku em li jorê ji li ser van hêmanan rawestîyan, ev hîn ji di nav gelê me yê misilmankirî de girîngiye xwe diparêzin û didomînîn. Di nav gel de, gelek jê nîzannîn ku ji ber ci ev tên gotin. jîderk û kana van baweriyan ci ne.

Em dikarin bibêjin ku, paseroja me Kurdan di nav van baweriye me de, di zargotinê me de veşarî ye. Em dikarin bi alîkariya vê çanda xwe ya kevnare paşıya xwe ronî bikin. Mînak kesen ku li ser destana Memê Alan lêkolin û légerîn kirine dibêjin ku, ev efsane beriya zayina Isa pêxember e. Rast e, heta di destana Memê Alan de, debaşa (behsa) pirrxweditî tê kirin. Mînak. Memê Alan ji bo ku di cem de bibihure wiha dibêje: "Ez bi Sultanê Bayê bikim, ez bi Sultanê avê bikim."

Zargotina Kurdi bi her awayê xwe ve, li benda me tevan e, ku em li serê vekolin û légerînan bikin. Paşeroja xwe bi tenê em dikarin bi saya van nîrxen xwe yên devkî ronî dibin.

## Încîlê werdigerînin Kurmancî


Pirtûka ola filetiyê Încîlê ji aliye "şîr-keta Kitabi Mukkades" ve li Kurmancî tê wergerandin. Ji bo wergerîne xebat, di navbera rojîn 20, 23 meha Nisanê, sala 1993'yan de, li bajarê Stenbole dest pê hate kirin.

Heyetek pisporên wergerê, ji bo der barê teknika wergerê de a-gahiyan bidin hatin Stenbole û dest bi xebatê xwe kirin.

Di nav heyetê de kesen pisporên zimanen hene: her kes hindiktrîn di du an ji sê ziman de pispor e. Sirketa "Kitabi Mukkades" pişti agahiyan li ser teknika wergerê, dê dest bi wergerîna Încîlê ji bo zimanê Kurmancî bikin. Ev

şirket bi taybetî karê wê li ser wergerîna pirtûkên oli yên filehan e. Bi taybetî ji Încîla Isa pêxember hema hema wergerandine hemû zimanê dinê ye xwedî nişîv.

Kese ku ji bo agahiyan der barê teknika wergerê, de di navbera rojîn 20-23 de, dan navê wan ev in: Prof Manuel Jinbasian (Fransa), Prof. Dr. Paul Ellingworth (İngiltere), Dr. Tomas Kaut (Almanya), Mr. Bailey Nicolas (Amerika), wergerê zimanê Kurdi Mr. Nadir Efo (Ermenistan Wergerê Kurmancî), Kaya Mustakhan (Zimanê Kurmancî) Abdullâh Varli (Kurmancî-Erebî) û Dr. Marian Beerle Moore.



Berga Încîla bi Tirkî







Dimenek ji filmê 'Klamek Ji Bo Beko'

**Klamek Ji Bo Beko:**

# Serkeftineke hunerî polîtîkayeke mirî

**Selîm Biçûk**

Di roja 7.4.1993 yan de cara pêşin dê filmê Klamek Ji Bo Beko li bajarê Hannover a Almanya bihata pêşkêşkirin. Bi sedan kes li salona sînemayê li hev kom bûbûn. Li hêviyâ filmê yekemîn ê Kurd bûn.

Dilê min lê dida. Gelo ev film ji mîna her filmî û bi zimanê Kurdî ye? Dê ci bîne ber çavan? Dê ji hezaran pirsgirêkên Kurdî kijanê anîbe ziman?

Bi şadiyeke gurr, tevî tirse ke bê-sînor ez bi temâsevanan re derbasî cihê ku film lê bihat nişandan, bûm. Bi çend gotinan Nizamettin Arîç film vekir. Ez bawer nakim ku, kesekî ji temâsevanan ev kîlî bêgirîn bîhurandibe. Gelo rast e, bi Kurdî ji filmê sînemayê çebûn?

Belê ne xwen e, mîna gelek tiştan ev ji pêk hat û hêdi hêdi maftdarî cihê xwe digire.

Bi kurtî çiroka Klamek Ji Bo Beko ev e: Beko û Cemal du birayênu ku ji Sirûcê ne, ji bakurê Kurdistanê. Dema leşkeriya Cemal tê, lê bi bîryareke dirust û mîranî distîne. Naxwaze leşkeriyê ji bo dewletê bike. Kekê wî Beko dixwaze wî bişine Ewrûpa, pişti ku leşkeriya xwe bike. Lê Cemal dibêje:

"Ez dê birevim Başûrê Rojava û ji wir ji biçim Başûr teví pêşmergeyan bibim." Pişti reva Cemal leşkerên Tirk têngund, di şûna birayê wî de, di dîmenê hovane de, Beko digirin. Belê, parçeyek ji jiyana rojane ya Kurdistanê tê berçavan.

Di rê de şer derdikeye, di navber leşkerên Tirk û gerilayê PKK'ê de. Beko direve ber bi sînorê "Sûrî" ve û dixwaze biçe Başûr li birayê xwe bigere. Dem sala 1988'an e. Li Başûr parçeyek ji jiyana gelê Kurd tîne ber çavê temâsevanan, bi taybeti dema qirikirina Helepçe...Keçek ku bi çekê kimyawî hatiye birîndar-kirin, tîne Almanya. Li Almanya dibihîze ku birayê wî Cemal dema revê li ser sînor tê girtin. Ew ceza dîkin û dişinin leşkeriyê. Di operasyonê de, li gundê wî bi destê Kurdistan tê kuştin.

Filmê Klamek Ji Bo Beko, di sînemaya Kurdî de mîna gava yekemîn, serkeftineke hunerî ye û pirr hêja ye ku em Arîç spas bikin; serkeftinê jê re bixwazin. Lê girîng'e ku bi her alî ve û bi çavekî rexnegirî em li ser film rawestin. Ji ber ku huner neynika civakê ye, dîmen û siyaseta civakê berçav dike. Di mercen Kurdistanê de ev taybeti hîn bêhtir pêwist e. Li welatekî

weki Kurdistanê pêwist e her kar û xebat; jiyan bi xwe ji girêdayî politikayê be. A ku sud (kêr) û berjwendê gel di-parêze. Beyî ve politikayê jiyan mirin e.

Di destpêkê de Arîç, di rola Cemal de bûyera revê ku ber bi Başûr ve ye; bi taybeti di salên 1988'an de, bi awayekî dinirxîne ku kozmopolîтика sosyal şovenen Kurdistanê dipejirîne. Herdem şerê gel bi şoreşa Vietnamê, Sovyetê, Nikaraguayê, Filistînê reş dikirin, lê li ba wan, li berçavên wan di Kurdistanê de ci dibe kor in, nabînin. Kerr in, nabîhîzin, lal in naheyivin. Derdora gundê Beko tije gerîla bû.

Lê Cemal di sînor re derbas dike, tê girtin û di dawiyê de bi destê Kurdistan tê kuştin. Bila şas neyê têgîhiştin, başûr, bakur, rojhîlat yek in; gerîla û pêşmerge û hemû gelê Kurdistanê yek in; Tev cangoriyêne welatê xwe ne.

Ez dixwazim çend pîrsan ji Arîç bikim. Dixwaze ci bîbêje, di sala 1988'an de şerê li Bakur şas bû an tune bû? An ji dem ne dema şer bû? Kuştina Cemal bi destê gel tê ci wateyê?

Di dawiyê de em hunermendê Klamek Ji Bo Beko spas dike û serkeftina wan dixwazin.

# AZADÎ

Abdurrahman Durre



## Kûseloyê Bexdayê

**S**efirê (balyozê) dewleta Iraqê, li Enquerê, di beyana xwe ya rojnameya Günaydinê, ya tarîxa 12.4.1993'an de, wiha dibêje: "Xwedê nîşan nede, ku li bakurê Iraqê dewleteke Kurdî bê çekirin, wê bela wê bipijiqe Tirkîyê jî. Divê dewleta Tirk û Iraqê bibin yek û nehêlin Kurd serê xwe rakin, bi Celal Telabanî jî nexapin".

Balyozê muhterem (kûseloyê pencikqirêj) hezreti Tîkrîti wilô ferman dike û kîn û xwîn vedireşe, herweki hemû birayê devmisilman ên dilgawir, di nava wî yê pîs de jî, ew kîn, xilt û cilq dikele û bêhna genî jê diavêje.

Ez dixwazim ku ji wî kûsiyê pencikqirêj ê Bexdayê vê pîsê bikim. Gelo Kurd qet weki Erebêne kulîxur û şivanê devan ên lepqirêj û devgilêj jî nabîn. Serokên Kurdan jî qet weki ew şêxên wan ên dûvdîrêj û lepqirêj jî nabîn. İnsaf, kûsiyê Bexdayê însaf. Dinya hemû bûne mirov, hûn hê jî cenawer û hov mane. 20-30 dew-

let û hikûmetên we, koma hov û barbaran kûselo û marran, hîrç û xwînxwaran hene, nabîn bela. Lê ku dewleteke Kurdî çebibe wê bibe bela. Erê, erê kûseloyê Bexdayê yê pencikqirêj!. Rast e, hov tu caran nabîn mirov.

Di baweriya min de, bersivdayîna hovan jî kêmâsiye. Lê dîsa jî ez dixwazim rastiyekê dîrokî di bîra hezreti Tîkrîti de werînim, belkî bi wê rastiyê, hedê xwe binase û fêm bike, evqas jî bêmentiq û bêfedî nebe, hînek jî weke mirovan bifikire û bizanibe ku, barbarî û hovîti hertim kirêti û kêmâsi ye. Hezar sal berê jî, niha jî.

Pişti İslamiyetê ku, Ereb İranê işxal dike, şâirekî Farisan wiha dibêje: "Ey felek, lanet li çerxa te bê, tifû were li rûyê te, tu qet şerm û fedînakî ku, kulîxwîr û müşkîxwîrên qûmê, şivan û gavanen devan, kûseloyen sehayê yê hîrç û hov, ketine bîrc û serayen Kesra û Dara..."

Ez jî dixwazim ji balyozê Iraqê yê hov re bîbêjim ku, tu ji qet şerm û fedînakî ku dibêji "Xwedê nîşan nede dewleteke Kurdî were çekirin". Çima ji we kûsiyên Erebîn re 20-30 dewlet û hikûmet hatine çekirin, çima ji 30-40 milyon Kurdre çênebe? Qaço hûn doza misilmanîyê dike. Serokê we yê xwînxwar û barbarî jî dibêje ku ji nesla pêxember e. Pêxember jî gotiye: "Çi tişte ku hûn ji xwe re dixwazin, heta ji hemû birayê xwe yê misilman re jî nexwazin, hûn nabîn misilman û hûn bê iman in".

Tîkrîtiyê hov! Bi rastî jî hûn bê iman in, hûn ne misilman in û hûn tu caran jî nabîn mirov.

Ez vê jî bîbêjim ku, bi duayen sa kût ji esman nabarîn. Di 15.4.1993'an de, Hikûmeta Federe ya Kurdî me dawetî Kurdistanâ Başûr kiriye û hikûmeta Kurdî filen çebûye û heye jî. Xwedê hez bike roja pêncsemê em dê herin ziyaretiya wê hikûmetê. Hezreti Tîkrîti ci gevezetiyen dike bîla bike.



Ev kom di sala 1992 yan de li bajarê Bollnäs-Swêdê hate damezirandin. Hejmara komê 10 zarok in û tenbûrvanê komê heval Ednan e. Ev kom bi xwe endamê Hunerkomê ye. Li gelek şevêni Eniya Rizgariya Neteweya Kurdistanê û Swêdiyan besdar bûye.

Repertuvara komê jî stranê folklorik in. Di gel vê jî, dê dest bi stranê nû jî bîke...

Endamên komê:

1. Cahide
2. Fatos
3. Evîn
4. Nesrin
5. Gulê
6. Ezîze
7. Üsif
8. Şerif
9. Deniz
10. Özkan

Adnan Torî berpirsiyarê komê dibêje:

Di sala 1977'an de min dest bi tenbûrê kir. Fêrbûna wê sanahî (hêsan) bû... Dema ku ez baş fêr bûm, ez li dawet û şahiyêne hevalan her dem besar dibûm...

Di sala 1984'an de min qasetek tomar kir (dagirt). Hengê min berhevokek hebû, naveroka wê nêzîkî 60 stran bûn. Dema ez çum leşkeriyê, leşkeran bi ser mala me ve girtin. Birayê min ji tırsan ew berhevokek şewitand. Ew jî heya ku em nekevîne belayekê... Piştî leşkeriyê min li ser lêdana tenbûrê xwe pêş xist...

Ez niha li derveyî welêt im û min xwestinek heye ku, xwe bêhtir bi pêş bixînim. Hemû ji bo gel û welêt.

#### DU KEÇEN ÇALAK

Şevekê çum mala Kek Hisyarê Cizîri û Xanim Cihana Betê. Keça wan Nalîn 10 salî ye, hat û destê min hejand û wê ez ji herdu rûyan

# Koma Şehîd Sefqan



maç kirim. Ev keça biçük gelek hez ji min dike û weke zarokên din evîn û hêzeke bêşînor dide min! Ew jî bi saya serê şehîdan e! În ku di gel me dijîn... Hema bi xêra zarokên weke Nalîna hêja, hûnera min roj bi roj firehtir di-be. Nalîn gelek hez ji go-vendê Kurdî dike û ji min jî govenda Bablekan û Eyşokê fêr bû. Zarokên weke Nalînê gelekî şanaziyê (iftixar) bi wan dikim û alîkariya wan dikim. Hemû ji bo armanca E-niyê.

Paşê, xwişka wê Heyam kemana xwe anî û ji me re

muzîk lêda. Wê alîkariyek ji min xwest, min jî li gor karîna xwe destê alîkariyê dirêj kir... Di wê şevê de me pêkve (bi hev re) muzîk lê da û min stra. Li dûmahiyê, babê wê ji stra, lê mixabin ku ci (tu) stranek neda min! Bi rastî stranê wê yêñ xweş û tekûz hene.

Li dûmahiyê, ez spasiya hemû zarok û xortêne Kurdan dikim û heke kêmahî û çewtiyên min hebin, bila li min biborin! Ez li hêviya evîn û hêza wan im û hemû ji bo rastiyê...

Strana Dostê pêşkêsi za-

rok û xortêne welatparêz dikim! Wisa pêşkêsi evîna xwe dikim, ya ku ji min dûr ketiye...

#### STRANA DOSTÊ

Aliyên me agir e,

dostê bistre

Şehîdê me nemir e,

dostê bistre

Lê bêdadê bistre, bistre.

Rîhana Kurdistanê,

dostê bistre

Rabe ji bo jiyanê,

dostê bistre

Gula Botan bistre, bistre.

Kula me ye serxwebûn.

**Heyam Cizîri**

dostê bistre

Ava dibe bi can û xûn.

dostê bistre

Biskrihanê bistre, bistre.

Geş bike serhildanê.

dostê bistre

Xweş bike berxwedanê.

dostê bistre

Ez gorî, de bistre, bistre.

Ji bîr neke şehîdan.


dostê bistre

Xwe dûr neke ji egîdan.

dostê bistre

Hawar e de bistre, bistre.

**Beşîr Botanî**



Koma Şehîd Sefqan

Beşîr Botanî û Nalîn Cizîri

Bi muzîsyena Kurd Cemîla Celîl re li ser muzîkê sohbetek:

# ‘Têkoşîna gel stranê me jî guherandine’

**LONDON-** Muzîsyena Kurd a navdar Cemîla Celîl wiha dibêje: “Têkoşîna gel stranê me jî guherandine.” Cemîla Celîl li paytexta Îngilîstanê, London, der heqê dîroka stranê Kurdî de dîtinên xwe diyar kirin. Di axaftina xwe de, li ser zilm û zora li ser gelê Kurd jî sekînî û wiha got: “Berê stranbêjan li gel evîniyê xeber jî dimeşandin. Lê niha helbestvanî jî pêşve ketiye. Ü stranbêj, helbestêneteweyî û şerê gelê me dikin stran û dibêjin. Yek jî van helbestvanan Cegerxwîn e. Niha tesîra pêşmerge û gerîlayêne me jî li ser stranbêjiya me heye.”

Cemîla Celîl der heqê dîroka zargotina Kurdan de jî dîtinên xwe wiha anî ziman: “Zargotina gelê Kurd pîr dewlemend e. Ne tenê pisporêne Kurdi, lê gelek kesen ji derve jî li ser zargotina Kurdan xebatê dikin. Helbestêneteweyî Kurdi yên epîk û kevneşopêne zargotinî, wek dengbêjan jî li gel stranê Kurdi bala zanyaran dikişnin. Stranê ayînên olî (dîni) yên Yêzidiyan tradisyonên pîr dewlemend bi xwe re tînîn.”

Cemîla Celîl di nav zargotina Kurdan de cihê stranan wiha danî: “Di nava zargotina Kurdan de cihekî berbiçav û héja, stran digirin. Van stran em dikarin bi çar babetan parve bikin. Stranê gundiyan, stranê bajarvaniyê, stranê evîniyê û stranê ayînên olî. Li vir em diyar bîkin ku, qewl û beytên Yêzidiyan ên olî bi stran û maqam têne gotin. Lewma jî ew jî cihekî di nava rêza stranan de digirin.”

## STRAN JI WINDABÛNÊ XELAS BÛNE

Cemîla Celîl li ser xebatê stranbêjiya Kurdan a li Ermenîstanê jî sekînî: “Di sedsala me de, jî salêne 1930'an vir ve, li Ermenîstanê, komkirina bernivîsar û çapkirina zargotina Kurdan û pê re stranê Kurdan bi xurtî pêşve cûye. Di nav Kurden Yêzidi de gelek xebat hatîye kirin û stranê Kurdi hatîye berhev-



Cemîla Celîl (aliyê rastê) bi Fatoş Güney re

**Cemîla Celîl li ser dîroka stranê Kurdi peyivî û di peyvîna xwe de li ser têkiliyên zilm û zora li ser gelê Kurd û stranbêjiyê jî sekînî û wiha got:** “Gelê me li hember zilm û zordariyê naşikê, li pêy şîna giran şahiyê dike, namire. Berê stranbêjan li gel evîniyê xeber jî dimeşandin. Lê niha helbestvanî jî pêşve ketiye. Ü stranbêj helbestêneteweyî û şerê gelê me dikin stran û dibêjin. Yek jî van helbestvanan Cegerxwîn e. Niha tesîra pêşmerge û gerîlayêne me jî li ser stranbêjiya me heye.”

## HELBESTÊNETEWETIYÊ Û ŞERÊ GEL

Cemîla Celîl di axaftina xwe de cih da zilm û zora li ser gelê Kurd û tesîra wê ya li ser stranan rave kir.

“Di roja iro de zargotina Kurdan a stranbêji û evîni dîsa di nava gel de dom dike. Lê niha di parçeyê Iraq û Tirkîyê de li ser Kurdan qirkirin û jenosid hene. Ev jî tesîre li ser stranê Kurdi dike. Gelê me li hember zilm û zordariyê naşikê, li pêy şîna giran şahiyê dike, namire. Berê stranbêjan li gel evîniyê xeber jî di-

meşandin. Lê niha helbestvanî jî pêşve ketiye. Ü stranbêj helbestêneteweyî û şerê gelê me dikin stran û dibêjin. Yek jî van helbestvanan Cegerxwîn e. Niha tesîra pêşmerge û gerîlayêne me jî li ser stranbêjiya me heye.”

## STRANÊ GOVEND Û EVÎNIYÊ

Cemîla Celîl, di dawiya axaftina xwe de li ser stranê govend û evîni sekînî. “Di nava stranbêjiya Kurdi de, stranê govendê cihekî berbiçav digirin. Stranbêj di şahî û dawetan de, gelek car def û

zurne sekînandine û bi stran û rîtmên xwe, bi saetan govend meşandine. Stranê gelê cure ne: Ya pêşin rîtm, ya duduyan xeber, ya sisêyan cihê pêşin xeber, paşê melodî digire.

Di nava stranê Kurdi de stranê evîni cihekî pîr xurt digirin. Kîjan jin û mîrê Kurd dikare evîna xwe bi stran bibêje. Weke ku keçika ku jî lawîkê diçe xerîbiyê re, bi dilekî bi şewat, tije derd û xem dibeje: “Lawîko qurban, gava ku tu çûyi welatê xerîbiyê, min bike sêveke sor têxe bêriya xwe.”

- Li ser navê İMC Basın-Yayın Ltd. Şti. (adına) Xwedî (Sahibi) Zübeyir Aydar
- Berpirsiyare Giştî (Genel Yayın Yönetmeni) Abdullah Keskin • Berpirsiyare Nivîsaran (Yazı İşleri Müdürü) Mazhar Günbat
- Navîşan (Adres) Başmusahip Sok. Talas Han 16 Kat:3 No:301 • Tel (fax) 512 12 87
- Berpirsiyariya Ewrûpa • Postfach: 1531, 5300 Bonn 1, Germany • Tel: (49) 228-630990 • Fax: (49) 228-630715
- Berpirsiyariya Fransa: Amed Jemo • Rue G-401, 92763 Antony Cedex France
- Çapkirin (Baskı) Metinler Matbaacılık • Belavkirin (Dağıtım) Birleşik Basın Dağıtım AŞ